

TIRÊJ

KOVARA ÇANDÎ Û PIŞEYÎ

Hejmar:3 Sêl:1980

HEFT XWEZIL BI WAN ROJA /

FLIT TOTANI

HELBESTÊN MEM RONGA:

- Va Destê Mî
- Çarin

HELBESTÊN MALMÎSANIJ:

- Evro û Meşti
- Zerra Mî
- Ma Bî Çıman Diy

ON A ZAZA VOCABULARY

PİRA HEWT SERA (Estenaki) /

Arekerdox: DEWIJ

1960'DI ZAZAKI / Roşan BARIÇEK

ZARGOTIN

FERHENGOK

www.arsivakurd.org

www.arsivakurd.org

TİRËJ

Hejmar : 3
Sal : 1980

KOVARA ÇANDE Û PIŞEYI

têxistri

RABERÎ	3
ŞÊLA SİYASÎ, DERXISÛSA ZMAN DE / Serxas ARDA	5
ZAZAKÎYÊ EZÎRGANI Û DİYARBEKÎR / Pankisar ZERTENG	7
STRANÊN ME (Helbest) / Rojen BARNAS	16
ÇANDEYA NETEWYÎ	17
HELBESTÊN MEM RONGA :										
● Va Destê Min	20
● Çarin	21
HELBESTÊN MALMÎSANIY :										
● Zerra Mî	22
● Ewro û Meştî	24
● Ma Bî Çiman Diy	26
HEFT XWEZIL BI WAN ROJA / Flit TOTANÎ	29
1980' DI ZAZAKÎ / Roşan BARÎÇEK	38
ON A ZAZA VOCABULARY	41
DI NAV ÇANDEYA GELÊRÎ DE HIN HÊMANÊN MITOLOJÎK /										
Mihamad QASIM	43
VER GIROTIS (Helbest) / GELIC	48
ÇIBENOKÊ ZAZAKÎ / Arêkerdax: DEWIJ	49
PÎRA HEWT SERA (Estenakî) / Arêkerdax: DEWIJ	52
ZARGOTIN										
● DU DÎLOK Wexta Mehîrê	58
● Xanê Beyazê	59
FERHENGOK										
● KURDÎ Û TIRKÎ (Kurmançî - Tirkî)	60
● ZAZAKÎ - TIRKÎ	66

Sahibi : Enver YÜZEN / Mesul Müdür : Ahmet Bozgil / İdare Merkezi : 850 Sok. No : 51/A 3. Beyler Kemeraltı - İZMİR / Dizgi : Evren Matbaası / Baskı : Doğan Basımevi / Fiyatı 75 TL. Yurtdışı İki katıdır / Basıldığı tarih: 7.8.1980

www.arsivakurd.org

Şêla Siyasi, Derxîsûsa Zman De

Serxas ARDA

Iro, çî bigre li gîştî peleyên dinê; jî hev veqetandina zmanê nivisanê û ya zmanê axaftina ne maye. Li her welatî, li her peleyî zmaneki heye; zmanê neteweyî.

Zmanê bilind an zmanê nivisanê ya aristokrat, jiyana xwe bi çoreşa bûrjîwazî qedand, tevî klasizmê ket nav rûpelên diroka vijeyî. Bî bîwêjeki dinê gotina wî bivê; zmanê bilind, bî paşî lêhatina bandêriya (hegemonya) çîna ferdalî, pêşî, jî hev belav bû. Zmanê gelêrî digel axaftinê bû zmanê nivisanê jî.

Bûrjîwazî, nivîskarên bûrjîwazî; bo domandina pergala xwe ya mêtinkar û sewsî kirina gellî, bî zmanê gelêrî xitabî gellî dikin. Nivîskarên pêşverû, welatparêz, çoreşger jî bo hişyar kirina gellî li hember pergala mêtinkar û mêtîngehkariyê bî zmanê gelêrî ango bî zmanê xwe xitabî gellî dikin. Her dû alî jî di xitab û muxatab de digihîjin hev lê di birûbawerî de jî hev vedîqetan. Ji ber wî, zmanê nivîsani jî zmanê axaftinê, jî ya gelêrî di heymana me de venaqete. Divê venaqete jî. Veqetandina zmanê nivîsani, dibê ku jî aliyê rêzdariya xwe ya hevok-sazîya rêzmani, û jî biserûberîya xwe, jî zmanê axaftinê veqete.

Pistî vê rastîkêniya (heqîqet) zanistî û gelemper, me divê li ser zmanê me î TÎRÊJÊ û li ser şêla me î siyasi derxîsûsa zmanê Kurdi de rawestin.

Zmanê Kurdi, bî rewşa xwe ya iroyîn hê pêvajoya xwe î yekitiyê ne qedandiye. Ne bî tenê di nava zaravayan (lehçe) de, lê di nav devokan (şîwe) de jî, têveliyên (ferqiyet) girîng hene. Kurdeki Malatê û Kurdeki Hekarê, bî hêsani jî hev fêm na kin. Digel her dû jî bî zaravayê Kurmancî diaxêfin, bo ragihandina daraz û datwazên xwe, hewcedariya bî Tirki axaftinê dibinin. Ev gelş (muşkil) ne tenê di Kurmancî de lê di zaravayê Zazakî (Dimilî) de jî heye. Pêwîst e, ev gelş bê bîşaftin. Bîşaftinê vê gelşê, ancax bî zmanê nivisanê, bî xwen-

din û nivisandinên bi Kurdi gongas (mamikan) e, bi rêberî û rê nişandayîna weşanan siviktir û hêsatir e.

Ji bo bişaftina vê gelê, azinên (metod) lê bê şopandin divê çî bin:

1. Bêje (kolime) û biwêjên (tabir) Kurdi bikar anin. Ev bêje û biwêj, ji kijan zaravayê Kurdi dibin, bla bin. Dî dewsa «heqîqet» a Erebi; «rastikên» ya Zazaki dîristir e. Dî dewsa «istiqbâl» a Erebi; «Mandi» ya Sorani çima neyê bikar anin? Jêmaye; ji mirasê, jêza, ji orijin û kôkenê, kirdayetî —bi Sorani— ji hikûmetê gelo xweştir nînin?

2. Dî nivisan û axaftinên rojane de, dî dewsa bêje û biwêjên Erebi û Tirki de, yê Kurdi bikar anin, bi der û dora xwe hewisandin, li serê bi rikoyî (inatkarî) rawestan.

Mîna her zmanî, dî Kurdi de ji bêjeyên nû, yê dî himê xwe de dî Kurdi de tu ne bin, raçandin; pêwîst û dîrist e. Lê ev raçandin gava yaxurî bin û mantiqa rêzmanî (gramer) Kurdi dîr bin, dibin sedemê tevz û tinazan. Her wekî «şoreşvan». Şoreşger bêjeki rast û dîrist e, lê «şoreşvan» çî ye? «Şoreşvan», mîna aşvan, mîna şivan, mîna gavan, çavdêrî û danêriya şoreşê dikê? Heke ev «şoreşvan» dî mana «révolutionnaire» = «devrimci» de be, ne dî cih de ye. Hêvmanayê «révolutionnaire» = «devrimci» bi Kurdi bêjeye «şoreşger» e. Ev bêje, hevedudaniyê ji bêjaya «şoreş» û parkita «-ger»ê ye. Dî «-ger»ê de, hêvotîn, hindav (istiqamet) û yan, kînan, karin heye Parkita «-ger»ê libatî ye (aktîf e) mîna parkita «-van»ê ne tebatî ye (pasîf e). Ji ber vî qasî yê ku bêjeki ji arziyahiye (ihtiyacê) racine, divê berî her tiştî bi rêzmanî Kurdi bi hîr û kûrî bîzanibe. Dî dewsa bêjeki heye yê Kurdi de, bêje raçandin ne dîrist e, em li hember vî ne.

Cih bi cih, zmanê nivisarin TÊRÊJÊ ji hin xwendevanan re-yê derxissûsa zmanê Kurdi de baş negihîştî ne-wê giran bê. Ev giranî, ji axaftina yekî Dîyarbekrî digel yekî Malatî, ji ya yekî Hekarî digel yekî Mêrdînî an Êrfayî, girantarin nîne.

Bêje û biwêjên giran dixuyên, her û her Kurdi-jêza ne. Lê dibe ku ew bêje an biwêj dî devokêk (şîwe) an dî çend devokan de neyê zanin. Lê himin dî çend devokên mayî, an dî zaravayê din de tê zanin û bikar anin.

Armanç, ne zmanê nivisani ji zmanê gelêrî cihê afirandin an çêkirne. Na xêr... Armanç, ji tengasiya gerineka devok û zaravayan fîltin, pêvajoya ber bi hev çûyîna zaravayan û yekitiya zmanê Kurdi bi lez-xistîne.

Ev têkoşîna dî warê zman de, perçeki ji têkoşîna li hember mêtinkarî û mêtîngehkariyê ye. Ji têkoşîniya bi xwe ve-hatinê nayê veçandîn. Divê her têkoşer, rewşenbîr, xwenda dî vê qorê de cîyê xwe bîzambe û daneki zûtir cîyê xwe bigre.

Zazakiyê Ezirgani û Diyarbekır

— PANKISAR XERTENG —

Dormarê Ezirgani dir Kırdki yani Zazaki (Dımıl) qıssey beno. Senê ki hergu ca di qıssey ciya ciya yê. Dormarê Ezirgan (Erzincan) i dir zi tewirina qıssey beno. Çıqas ki yew zarawa bo zi, Zazaki miyan di beyntarê fekan di ferqê zaf ra tayi estê. Zanayışbê ma hetî fekê Ezirgani, fekê Dêrsimi miyan di yew şax o. Yani fekê Ezirgan zi fekê Dêrsimi sero hesabeno. Beno ki Zazakiyê Ezirgani zi xwi miyan di ca ra ca yewbinan nâ tepişo. Ma yew dewijê Ezirgani ra, yew imbazi ra ni qıssey û vatey Ezirganê cêrêni gırewtım, Zazakiyê Diyarbekır vero nawıtım. Cêr ra şıma, çend mijaran di veracê niyan veynenê.

Diyarbekır dir, Hêni, Pıraş, Gêl, Çêrmûgi, Şonkuş (Çüngüş), Qulp, Liji, Hezan dir Zazaki qıssey beno. Tayi şarê Farqini (Şiliyan) û Hezroy zi Zazaki qıssey kenê. Niy cayan hemini dir qıssey û vatey pêro yew niyê. Ma vajim, qısse kerdışê Çêrmûgi û Şonkuşi nızdiyê Zazakiyê Sêwreg û Gerger (Adiyaman) i yo. Ow qıssey ni cayan, ay binan ra vişêr Zazakiyê Dêrsimi ser şonê. Kemane û çewtêy ma, ku bibi. Mela wendoxi, ma biyari rayiri ser, ma hagidarê, kemaneyan bikerê. Gelo bes niyo erey kewtişê ma? Heya key vindertiş û pawitiş? Ma bi zerweşey cay (1) di wend ki qereçi (cingane) y zi biy wayirê rêzman (gramer) i. Ma bendedê çiy dim?

Ewro ra pey, ma wazenim ki Zazakiyê cayanê binan —ey Dêrsimi, ey Bedlis (Mutki) i, ey Qozlıx (Kozluk) i— Tirêji dir didim zanayış û fâhm kerdış. Labrê kes tena nê eşkeno niyan biyaro ca. Piyayey, qandê heme çiy bes a û weş o.

(1) b'ewné : ÇINGENE GRAMERİ, Kitaplar - Aylık Dergi, 2. sayı : 3, 1967 ; 9

TADIYAYIŞÊ (BEDELIYAYIŞÊ) TİPAN

Mıyanê feké Ezirgan (Dersım) i û fekanê dormarê Dıyarbekır dı vengi yan zi tip (herf) i estê kî pê nê manenê. Yew yew tipı ca bı ca tadiyahaya, bıya yewna tipı. Cêr dı şıma ni ferqanê binêkêyanı veynenê. Qısê verêni dormarê Ezirgan i ra, ay bini zi dormarê Dıyarbekır ra giyriyayê:

1 — S - Ş

dormarê Ezirgan I

dormarê Dıyarbekır

bervayını, bervayıs	bermayış
sond	şan, şon
pesewı	şewı
fıştı darı	vısto darı, eşto darı
asmi	aşmi, aşmı
aspiji	eşpiji, espici
vas	vaş
şıya	siya
sane	şane, şone
esnayını	eşnawıtış
sıt	şıt
nıwes	nêweş
sımitayını	şimitış
pey hesiyayını	pey hesiyayış
sami	şami, şomi
quşxane	quşxane
wışk	wışk

2 — Z - J, Ç

tuz	tuj, tuc
dez	dej, dec
purozin	pirjini, porcını
kez	kej
roz	roj
çızık	çije, çice
leji	lezi
torjen	torzin
bijék	bızék

www.arsivakurd.org

www.arsivakurd.org

layk	lajek, lacık, ma
honde	hunda, hendê, henda
ewke	ewk (naha, emın)
ze	se, zey, heze
dolım	donım
defena	fına (hewına, rayna)
toa	toba
unci, uncêna	anci, onci, oncına
raver	aver, over, ravêr
virniyê	verniy
hanawo	hınıyo, henıyo, hânıko
core	caro-n, caran
peyniye	peyni
tepya	tepa, tepiya

B — Qıseyê ki bincaran pê nê manenê zı estê, ma vajim:

goligê	her
çoxo	çakêt, kurtık
hagesi	xêza, cıtı, xetı
dun, dime	boç
estik	kate, este
percz	dihiri, toştare, tıştare
doman	gede,, qeçek, leyir, qıt, tut
herme	hingile, çengile, pol
tal	weng
perozaymı	taşti, teşti
hervê	lezı, rew
xeyle	zaf

HEVOK (CUMLE) AN MIYAN DI NAME:

Fekê Ezirgan (Dersım) i dı, qıseye kıname ya, vatışan û hevokan miyan dı fonksiyanê xwı reydi bedelêna. Ma vajim:

Çêneki der o	Keyneki dı wo, /Keyneki dir o, /Keynek do.
Çêneki de esto	Keyneki dı esto./Keyneki de esto
Zamayê xo ra niguret	zamay xwı ra nêgurot. / Zomadê xora nigrewt.

Ko re so	Ko ro şu. /Kû rı şuw
Cênêkî ra vaje	Cenêkî ra vaji
Mî ra va	Mî ra va. /Mî rê va.

BERNAVÊ KESİYÊ HİRINI:**Yekejmar -Neri:**

o, u	o, u, we
aw	aw, o
yê	yê, jey, ey, cı
ay (ayi)	ay, ayi
dê	yê, cey, jey, cı
di ra	yê ra, ey ra, jey ra, cı ra, ti ra

Yekejmar -Mayki:

da (daya, a)	ya (ja, yay, a, aya, tira)
aya	a, aya, ya

Pirejmar -Neri, Mayki:

dine (ina, yine, ine, ayna)	yini (jini, ini, cini, ina, ino, ayna ayno)
î (e, cı)	ê (i, yê)

BEANAVÊ (PRONAVÊ) «XO» :

Zazakiyê Ezirgani dır «xo», ca cayê Diyarbekır dır zi «xo» vajêno. Labrê ca ca zi «xwı» vajêno. Zanayışbê ma, «xwı» hina rast o. Çımka Kırdasi dı zi «xwe» vajêno.

peyniya xo	peyniya xwı, peyniya yê
piyê xo	piyê xwı, pi y yê
zamayê xo	zama y xwı
xorina xo	xorineya xwı
sarê xo	sere y xwı
riyê xo	riy xwı

RENGDÊR BIYAYIŞÊ ÇEND QISSEYAN:

Zazakiyê çöşmey Diyarbekır dır tay qissey estê kî «-ey» yeno peyniya yini û benê rengdêr. Çöşmey Ezirgani dır «-ın, -ını (-ine)» yeno peyniya ni qisseyan:

keçel - ını	keçel, -ey
rindine, rindekine	rindey
şirine	şiriney

Yan zi herrunda «-ye (-e)» ê Zazakiyê Diyarbekir di, dormarê Ezirgani di «-yî» yeno peyniya qisseyan:

wedardayî

wedardaye, hewa, naye, nımite

LÊKER (PIŞK) :

Zazakiyê Ezirgani (Dêrsim i) û dormarê Diyarbekir di peyniya rader (master) an ciya ciya ya. Peyniya lêkeranê Zazakiyê Ezirgani di «-ten, -ını, -en-ı (-ene)» esto. Labrê ey dormarê Diyarbekirdir «-ış, -yiş» esto. Ma vajim:

Ameymî (Ameyiş) :

a) Demaborî (Demewo Viyarte) :

ez amo / ez ama	ez amewo / ez ameyâ, ez ameyâ
tu ama	tî amey, tî ameyî tî ameyâ
o ama	tî amewa
a amey	o (aw) ame/ o amewo
ma amaymî	a amey, a ameyâ
şima amayî	ma amey, ma ameymî, /ma ameyî
i amayî	şima amey, şima amayî
	ê amey, yê ameyî

b) Dema Niho (Demewo Nî kayin) :

ez yon	ez yeno / ez yena
tu yena	tî yenî, tî yenê, tî yena
o yena	o yeno, we (aw) yeno
a yena	a yena, ya yena

c) Dema Pêşeroj :

ez yon (ez meşte yon)	ez yeno (ez meştî yeno)
tu yena	ez yena (ez-hîma-yena)
o (a) yena	tî yenî /tî yena
	o yeno /aw (we) yeno

a yena
 ma yeme
 şima yenê
 i yeni

a yena, ya yena
 mê yeni, ma yem, ma yenim
 şima yenê, şima yeni
 ê (I) yeni, yê yenê

çend lêkerê bini:

ez heşiyu pey
 ez xız bıya
 ez a ra ni vun

ez pey hesiyawo
 ez sermetiyayo, ez surrikiyawa
 ez ya ra nê vano, ez aya ra nê
 vona

ez vöšto
 ez ništo ro
 tu vaze
 tu heşiya pê
 yê virêzna ro
 çarna
 berva
 amê war

ez vazdawo, ez vazdaya
 ez ronışto
 ti vañ, ti vaje
 ti pêy hesiyay, ti pey hesiyaya
 ey qelebna (yê virit ra)
 tada /açarna
 berma, bermay
 amewar, homey diwar

Cor ra zi fahm beno ki hına vişi Zazakiyê dormarê Dîyarbêkur di kesê yekejmarî nerey û maykey di bedelênê.

ma gınaymî war
 ma çinemi
 rawozime (rawurcime)
 ma derzemi
 ma bikerim
 şima tever veji
 resenê pê
 inê esnow

ma 'erro gunay, ma gınaym, erro
 ma çinenê, ma çinemi, ma
 çinenim
 ma wardê, mawurzi, warzımı
 ma derzeni, ma derzem, ma
 derzenim
 ma bıki, ma bıkerê, ma bıkerim
 şima veji teber, şima teber
 vejênê
 ê resenê pê, pê resenê
 ini eşnawit, yinê eşnawito

Ferman (Emir) ê Lêkeran :

yekejmar - erinî :

cıxara bışımı
 bı fetelni
 pıra cê
 bı kını

cexra bışımı, b'ançî (b'oncî)
 bı çarnî, bı geyrnî
 pıra gê-r, xwî ra gêrî
 bı kenî

yekejmar - neyini :

meke	meke, meki
me wirze ra	me wurze, mewardı
nejdê di meve	têkilê ey mebi, tê-w medı
mehuye	mehwi, mewıye

pirejmar - erini, yeyini :

mekerê	mekerê, meki
bıkerê	bıkerê, bıki
bı fetelime	ma bıgeyrim, ma bıgeyre
qıse mekê	qıssey mekê, qalı meki xêberi
	medê

ÇEND HEVOKI Û PERSI :

aw kı vıriniyê de va	Ayo (aw) kı verni dı va
Pê reštena xo çetına a	Pê resayışê yini çetin o
To ra rındine ra von	Tu-ri rındey reydı vano
Guk lito	Gohk lewto
Hurdene hondê juvin ê	Wirdi hendê yewbınan ê
	Wurdi zey pê yê
koti diy?	koti diy /kura diy /ça dı diy
	kanca diy?
kotirawa?	koti ra y? / kura ray / ça ray
	kanca ra y? koti ra ya? /kura
	ra ya /ça ra ya /kanca ra ya?
çına y rê?	çiri /çirê /çınay rê?
çuko vani?	se vani? /çı voni /vani çıçı?
kamci?	kam /kacin? /kamık?
çitora (çutera)	senêni? /sekeni?

Stranên Me

Rojên BARNAS

Stranên me belav dibin çar ali

Çarmedor

Lî jêr

Lî jor

Lî ser berayiyê fereh

Lî ser bilindayiyê kûr

Û gurr

lî ser gerûya jinê

Stranên me

Mina helekela axê, dî berdestî bihârê

Bî mîzgin

Bî jin-çîrîsin

Belav dibin çarmedor

Çî dilok

Çî lawje

Çî payizok

Û çî kîlamên mîrxasîyê

Daraz û daxwazîyê

gîştan;

jîyaneki bextewar

serfîraz

bêna

Ne seri danin lî ber naçariyê

Û ne pêsitûri, lî ser serê hîna

Stranên me belav dibin çar ali

Çarmedor

Nivîsana me î reş dîmalin

Bî jin

Bî evin

Warê me î kor

Hêşin dîkîn

Jî nû va.

Çandeya Neteweyi

Dî hejmara bori de; me gotibû, çande diroki ye, navxwe û têvexwariya wê ji bal teşeyên cıvaka-abori ve tê hoyandin û çini ye. (1)

Çandeya neteweyi ji, ji dervayi vê peyitandinê ni ne. Ji ber ku netewe bi xwe bûyereki diroki ye. Sermiyandar û xulamên wan li hember dirokiya netewe dertên, dibêjin «netewe her dem hebû û wê her dem hebe». Lê gava em li pêşdeçûna cıvaki dînhêrin, derewên wan xweştir dixuyên.

Berîya sermiyandariyê yanî dî dema feodali de, welat perçe perçe ye. Her perçeki dî bin nîrê feodaleki (axa, beg, mir, lawmir û hwd.) da ye, û bi tixûbên feodali ji perçeyên dîn çetandî ye. Hilberin qelse, bo dîvîyahiyê ye. Dî nav perça de dan û standin pir kêm e.

Ber bi dawîya feodaliyê parvekirina kar pêşde diçe. Ta rêstevani, tevnivani gelek pêşde diçin û dibin şaxên xweger. Hilberina bo sûkê (hilberina meta) çalîkê «aborîya girtî» dişkêne. Rêyê nû çêdibin, ticaret û jîna abori xurt dibin.

Sermiyandari dî nava cıvaka feodali de zil dide, şax û reh berdide. Bi kurtayi xweyn li laşê cıvakê digere, girse ji xewariya feodali difilitin û bizavek nû tê cıvakê. Ev dem dema damezrina netewe ye ji. Bo vê yekê «netewe ne bi tenê kategorîki diroki ye; kategoriya çaxa sermiyandari ye, sermiyandariya ku xurt û geş dibe». (2)

Çîna sermiyandar dî vê demê de li hember feodala têkoşinek dişwar dani. Têkiliyê hilberini yê ku ji pêşdeçûna hêzên hilberini re dibûn bend, guhart. Hêzên hilberini, ji qeyd û bendên feodali filitin û pêşde çûn. Çîna sermiyandar ji alîki ve çandeya darengi, ji alîki ve ji çandeya giyani xurt û geş kir. Dî warê çandeya giyani de, li hember nîrê çandeya feodali û taritiya dêrê lejeki mezin dani. Dî warê pişe, ilim, wêje û hwd, da bi hezaran eser afirand.

Dî têkoşîna abori, rêzani (siyasi) û pêşdeçûna cıvaki de, li hember feodala, çîna sermiyandar seri dikişand. Dî warê çandeyi de ji,

disa ev çin pêşevan bû. Sloganê çina sermiyander, sloganê «çandeya neteweyî», di vê demê de bi pêşdeçûna civaki re lihevkerî û pêşverû bû. Lê pir ne çû, bûrjuwazî pêşverûtiya xwe wînda kir, bû çinek paşverû. «Çandeya neteweyî» têvexwariyek paşverû stand û di dest' wî de bû navginê xapandina çinê bîndest.

SLOGANÊ «ÇANDEYA NETEWÊYÎ» PAŞVERÛ YE.

Gelo «çandeya neteweyî» yekser, yek perçe û yek mende ye? An jî, ku em bi awakî dîn bîpîrsin: Gelo «çandeya neteweyî» jî derwayî hebûna çinên civakî, jî derwayî daxwaz û menfeetên çinî ye? Emê bersiva vê pîrsê bi neyînî bidin. Çewa di hemî civakê bi çin de çande n eyekser be, wisa «çandeya neteweyî» jî ne yekser e. Daxwaz û menfeetên hîmî çinan nayîne zman û hemî netewe na nîminê.

Di teşeya hilberina sermiyandari de, du çinên bîngehîn he ne. Yek jî van çina sermiyandara ye ku xwediyê navginên hilberinî ye û çina serdest e. Ya dî jî çina karkera ye. Ji navginên hilberinî bêpar e û bi firotina keda destê xwe jîna xwe didomîne. Daxwaz, menfeet û kirinên evan her dû çina, li dij hevûdinê ye. Ev dijîti, domdar û lihevna (antagonist) ye.

Cihêbûna menfeetên çinî, têkoşina çinan li dij hev; xwe di warê çandeyâ da jî nişan dide. Çina sermiyandar çandeya xwe diafirîne û serdestiya xwe di vi warî de jî pêk tîne. Li hember vê çandeya serdest karker û hêzên xebatker —jiqas qels be jî— çandeya xwe diafirînin. «Çandeya neteweyî», çandeya tevahîya netewe nî ne; «di nava her çandeya neteweyî de du çandeyên neteweyî he ne». (3)

Çandeya çinên serdest bi gelemperî paşverû ye. Ev çandeya sermiyandar, axa, beg, haham, keşe, şêx û mella ye. Daxwaz û menfeetên wan tîne zman, di têkoşina navbera çinan de xîzmeta wan dike. Lê, li hember vê çandeya paşverû, çandeyek ku jî hoyên jîna çinên bîndest û perçiqandî dertê he ye. Ev jandê «unsûr» ên sosyalist û demokratîk tîne zman. Çandeya çina serdest têvexwariya «çandeya neteweyî» ye. Çandeya demokratîk û sosyalist, bi «unsûrî dî nav çandeya neteweyî de ci digre. Têvexwariya «çandeya neteweyî» jî bal çandeya çinên serdest, jî bal çandeya paşverû ve tê tayîn kirin. Û «sloganê 'çandeya neteweyî' (bi gelemperî ilhamek ku jî bal Rû-Reş û keşeyan ve tê) deka sermiyandara ye».

Belê, sloganê «çandeya neteweyî», sloganê çinên serdest û paşverû ye. Sermiyandar, dixwazî bi navê «çandeya neteweyî» ferqên navbera çinan veşêrin û netewe yek perçe nişan bidin. Zanyariya

çinên bîndest, girseyên xebatkar şoli bîkîn û berê têkoşina wan bi hînek rêyên din ve bîbîn. Sermiyandar bi vê sloganê şowenizmê xurt dîkîn, di nav gel û neteweyan de neyartiyê geş dîkîn.

Sloganê «çandeya neteweyi», ji menfeetên çîna karker û hêzên xebatker re biyan e. Ew, ji çandeki wisa re xwedi dertên ku bi pêş-deçûna civakê re lihevkerî ye. Ev çande li hember çinên serdest daxwaz û menfeetên wan tine zman. Li hember neyarê wan i navneteweyi, birati, yekiti û hevalbendîya wan i navneteweyi bi karkêrên dinê re xurt dike.

Di bin hoyên sermiyandari de avakirina çandeyek sosyalist ne gengaz e. Çandeya sosyalist piştî biserketina şoreşê tê damezrandin. Lewra çin û hêzên xebatker di hoyên sermiyandari de ji «unsûrên sosyalist û demokratîk» re xwedi dertên, bo pêşvebirin û xurt kirina van «unsûra têkoşin dîdîn. Çîna karker li hember sloganê sermiyandaranî «çandeya neteweyi», sloganê xwe bilind dike: «Çandeya demokratizm û bîzava karkerên dinê i navneteweyi».

«Çandeya neteweyi» milîyetperwerîya sermiyandara di nîmine, ji sitem û kedxuriyê re xîzmet dike. «Çandeya demokratizm û bîzava karkerên dinê i navneteweyi» ji enternasyonalizma proletarya û welatparêziya sosyalist dînimine. Di çandeya her gel û neteweyan de çu unsûrên demokratîk û sosyalist hebe, jê re xwedi dertê, dostani û biratiyê dixê navbera gel û neteweyan, wan nêziki hevûdinê dike.

Ji sloganê «çandeya demokratizm û bîzava karkerên dinê i navneteweyi» re xwedi derketin tu cara inkariya teşeya neteweyi ni ne. Ji ber ku her çande di nav hoyên neteweyi de tê afirandin. Teşeya neteweyi xwe di zman, ehlaq, adet, teşeya jinê û hq. De nişan dide. Çandeyek ne a tu neteweyi be, li ser hemî neteweyan be û teşeyek neteweyi ne stendibe tu ne ye. Bo çandeyê teşeyek neteweyi bîvênevê ye. Ya giring têvexwarîya we ye. Bo vê yekê çîna karker rêzaniya xwe i çandeyi ewha datine: Têvexwarîki navneteweyi ku xwe di hemî xîsûsiyetên pêwari û neteweyi de bine zman. Ev «xîsûsiyetên pêwari û neteweyi», teşeya neteweyi ye.

1 — Tirêj, hj.: 2

2 — J. Stalin, Marksizm, Ulusal Sorun ve Sömürgeler Sorunu (Sol Yay.)

3 — Lenin, Ulusların Kendi Kaderlerini Tayin Hakkı.

4 — Lenin, Ulusların Kendi Kaderlerini Tayin Hakkı.

Di hejmara bori da, di dewsa «nauxwe» de «têde» hatiye nivîsandin; bi hevîya tê borina we.

Va Destê Mın

Mem RONGA

Ne tenê me dı vê evinê
ne tenê
bırayên mın hene li çar ali
li çar ali dinê
reş û spi, bındest û azad
bırayên mın hene li çar ali
hına rêzil qetand
hın dıkojn

rûreşiya mirovahiyê
bırına mın i xedar
mêtingehkari
bı tang û top û napalma
dı sıkratê de hovtir
êrişan tine.
bo spêda pır-nema
çar perçê dilê mın
yek stranê dibêjn

dızanın édi nexweşin
hêvi nexweşin e
ger ne hatibe strehandin
bı dengê geran û kerane
û reh ber ne dabe
dı axê de

destê min
lı destê te digere

ÇARİN

Mem RONGA

bızava bê ser û bê dawî
diherike
xweza dı keskek del û din da
xwe nû dîke .

Zerra Mı

— MALMİSANIJ —

Zerra mı, hını
Qandê waştada çimzeng û porkeç
û beşn bari û lewteniki
nê erzena, nê perpizziyêna.

Belê, ancina zi
Zerra mı nika ziz a.

Labrê a,

Çiqqas ziz

û zerrşıkta û perrşıkta ya,
pergende ya,
qandê çiyne wo.

Anka, zerra'm çehar lejg a,

Çehar şax:

Lejga yew, hiranê Piran i
û miyanê koyanê Dêrsım i dir
çanqıliyaya,

biya çewt.

Lejga yew, Silêmanya û Hewlêr dir
çungarriyaya.

Yew, çuşme y Mehabet û Senentêj ya
zey viya lây a.

Yew zi sindorê corênê Suriya vero,
heway tirmara
sırıkeya ya.

Zerra mı,
ceniya çehar mërde.
brina çehar çime .
û dara çehar şax a.

Nê tebetêna,
xwı wena,
mıyan dı ax û wax a.

Masaya,
nexefiya ya,
pendusa ya.
Yew şubna kî nê teçaya.

www.arsivakurd.org

Ewro Û Meşti

— MALMISANIJ —

Ewro ma renckêş im.
Tewgiran
 û kul û jan
 û bı brin im.
Brindar im,
 zertenk û zerteng.
Apey verdaye û nezan
 goni û gonaşir di surêla
 heze la,
 bariçek, ruçik şatıyaye,
 heremiyaye
 gewz kewte
 û gewz zerd im.
Miruz tırş, nêweş...
Ma wayirê derd im.
Dışmen, tim nebaş
Ze adır û şewat
 ne vind, ne tebat
 ver bı xırab o rewş,
 rewş, tewş...
La tim û tim
Kam vano ewro ra dım,
 wini beno, ena maneno.
Ewro ra pey,
Cıwan û cıwanık,
 keynek û lacık,
Karker û cîtêr,
Wende û roşenbirê welatperwer
 lej kenê,
 roşn kenê,
 tirêj bı tirêj ljeg danê.

Mestî,
Roj yeno ku
Wir roj beno roşan,
Hergu gamî ze sernewe û newroz.
Heme çiyde çay û ta'l û mîz
û tîrş û tuj
tepya maneno.
Ma vir de beno heze muj.
Ayo roj,
Serdest beno bîndest,
Bîndest beno serdest.
Heme kes serbest,
Ma heme pêdest,
yew dest im, yew dest.

Ma Bı Çıman Diy

— MALMISANIJ —

Ne peydesiyayış, ne zi vatebê şari,
Ma nê eşnawıt,
Ma bı çıman diy.
Ma bı xwı biy....

serrı, seserra vistını biy:

Merdıman,
merdimi incılınaynê
kerdnê incırax,
çiley kerdnê.

Merdıman,
pay xwı naynê merdımın ser,
merdan ser dı perraynê
şiyne çayme,
biynê berz,
biynê gırd.

Pêtan,
belengazan dı pêçî tadaynê.

Sermayedaran,
lepê xwı kerdnê pizedê palan û citêran
qeseba yini fek ra vetinê,
tıra kelepur gırewtnê, perey antinê
daynê yew kınar, pêser kerdinê.

Karker, ereqıyayni û şa'tıyayni.

Bêkar, lebiyayni
bı çımanê veyşanan
ewniyayni xwı ra cor.

Ref bı ref, qor bı qor,
Citêran serra wext, bı panc wexti
nimaj kerdnê, nimaj kerdnê keko biraol..
dest akerde y bı, ver bı asminan
ver bı cor.

Rencberan,
Xortan, xwendekaran
û kesanê şoreşgeran
kozikan di çok da bi
vera mêtîngêhkarên.
«Karê Huma y nexşên i»
Newîrnayey gure y dîna.
Merdîm tewîr bî tewîr
Hergu yew hewayna.
Tuti biy, «krem-şokella» werdnê
qorrîni zi werdnê sumîrî-heze lep,— puşrîgî.
Polîs û cendîrman,
xwî bendedê bîndestan naynê
xwî welatparêzan û şoreşgeran pelekînaynê.
Ordi kî dest na ser,
kê sucîrnaynê, kê veşîrnaynê.
Heme kes hîni zano kî
Dînaya gonarî
ewro qoçdê gay sero niya.
Dîna, rewna polanê karkeran sero ya.
Bî xebat û lebat, beno seracêr,
beno meqlum
no sazumano bûyîn û pûç,
kuffîkîyaye, zengarrîn,
gîyîn û gemarrîn.
Ganî ma bî zanîm heze kî vanê:
Tari û roşn,
şew û roj,
deme y Kawa y û Zerduşî ra
tê ver nanê.
Baş û nebaş,
Weş û nêweş,
wîşkey û terney,
ganîy û merdey
abî asan, pê vero şonê.

Peyeni roşney, tari vila kena.
Başey ver dı nebaşey derêna.
Neron û Spartakusê ewroyini
Peyni dı vera Dehaki benê zey Kawa y,
zey pola y.

Kawa y çendekı zafê,
Dehak i ehendi tay.
Yew rast o, ay bin şaş û çewt...
Çewt allızêno heze vilince.
Ta'da çewtey—aya kî bê sindor a—
şiyayox a.
Rastey şidêna, bena pêt,
Bena serkewte, bena sererast.

Heft Xwezil Bî Wan Roja

FIR TOTANI

... Ew çî roj bûn yaho ew çî roj bûn. Bi zêran, bi milyonan paş ve nayên. Ne wisa? Li ser bextê min, min bîzaniya wê paş ve bîn, minê deh milyonê xwe bîda serê. Himmam... Tu çî dibêji Sebri efendi?

Sebri efendi di nava herê û nayê de li Neco, li Necatê Hacı Mûsa axa dînhêri. Hevalên hev î zarokiyê bûn. Lê niha Sebri efendi li Îstenbolê di kareki de dixebiti. Navê karê wi tu ne bû, lê kareki baş bû di aliyê dravin de. Necat efendi tepeki li çoka Eliyê Şex İsa xist, domand:

— Tu zani? Ez û Sebri efendi di taxokî, di kuçokî de mezin bûn. Mina du bira. Nan û ava me çihê diçû. Lê weki dinê em her dû bi giyaneki bûn. Heta pirê şeva an ew li mala me, an ez li mala wan, tevi hev radizan. Tê bira te Sebri efendi? Tedi rojeki mêrikêki çiyayi li ber derê me tiri difiro. Her libeki wi weka hêka kewê bûn. Zîrîkê wi yê xêrê be, piçê Niyô, Nihatê Evdîlrezaq efendi ji hat ba me. Çû bi ser qatûvan de xwar bû, li tiri mêyze kir, fikand. Hat ba me, çav kir, got «we tiri dit, çî tiri ye. Av bi devê min ket.» Min got «tu dibêji em çawa kin?» Gote me «hun dengê xwe me kin.» Niyô mina rûvi li dorê mêrikê çeqlebaska da. Piçbav «xalokî» diqurifine, yê nîzanibe wê bêje ku vana xal û xwarzayên hev î ji dil in, qet av di nava wan de derbas na be. Wele Niyoyê me şalûsiya kir, xweş kir, xwe bi mêrikê şîrîn kir. Alkariya wi yê firotanê kir. Êdi xalo pê bawerîya xwe ani. Piç Niyô ji xalo re got: «Ha vi lawîkî heye ya, ha vi kurîkî» Sebri nişan da. Mêrik li Sebri nihêrtî, deng ne kir. Niyô disa, ica bi niçandîni gotê: «Xalo ha vi kurîkê ha heye ya, tu zani, sêwi ye. Çiqas gunê ye ne wisa. Bê dê û bê bav e, rebeno! Sêwiyê bê dê û bê bav pir gunê ne, ne wisa?» Xalo li min û Sebri nihêrtî, bala xwe da me. Drûvê sêwîya bi min û Sebri ne diket. Niyô çav kir me, serê

xwe hejand. Em her dû ji çûn nêziki wi ve, çûn cem. Niyo, piç Niyo destê xwe i rastê avêt stuyê Sebri destê xwe i bi şîqal di ser serê wi da, çû riyû wi. Bi awaki pê gunê xwe anin, gotê: «Na birê mîn, qurbana serê birakê xwe, dilê xwe bi xwe me şewitine.» Mêrikê xwediyê tiri mit û mat bûbû li Niyo û Sebri dinihêri. Niyo li mêrik ziviri, gotê: «Xalo hnek tiri na di Sebriko? Tu dibini çiqas gune ye » Hê xalo dengê xwe ne kiribû ku Niyo rahîşt gûşiki kafiri, rahîşt da destê Sebri û destê xwe di serê wi da, gotê. «Bira xêra dê û davê xalo be, jê re dia ki erê?» Sebri rahîşt gûşiyê û ji wê derê dûr bû. Niyo rākır gûşiki ji da mîn, gote: «Xalo tu dizani ev ji bê dê ye.» Mîn zû zû rahîşt gûşiyê tiri û ez ji ji wê derê dûr bûm. Mêrik rākır ciçleki da destê Niyo, Niyo rahîşt ciçlikê xwe hat ba me. Me tiriye xwe xwar, qedand. Lê em tamjin. Tu nîzani Eli efendi ew tiri çiqas xweş bû. Niyo got «Neco lawo em çawa kın, ez têr ne bûm. Hun ji têr bûn têr ne bûn?» Mîn, Sebri me her diwan ji stuyê xwe xwar kir. Niyo, piçbav hêdi hêdi çû hevsarê hêstirê ji direka elektrîkê vekir, bi destkêşî bi qasi neh-deh metra ji wê derê dûr kir, hat ba me, pêşiyê kevireki avêtê paşiyê pê de nîşka ve qirîya. Hêstir vecinîqî û rêvi. Haya xalo jê tu ne bû, bi tiri firotinê bili bû. Çarki dın, cartırki dınê bi hêstirê de qiri, hêstir da bezê. Xalo ziviri li pey hêstirê nihêri, malikê tu xirab ne bi. Wele ji efendiyê xwe re bêjın, mêrik pey hêstirê ket. Niyo beri zarokan da ji dora qatûvên tiri. Ku kes ne ma, me li vi ali li wi ali nihêrt, na kes tu ne. Wele kafirbavê Niyo qatûva nîvi da ser milê xwe û me da dû. Em çûn nav baxçe me, serê kaniyê û wele em li ber tiriye xwe pan bûn. Me tiriye xwe ew roj gişt qedand. Lê dotira rojê xêr û xweşî li we, kevır û kuç li me bari. Hefteki em viriki bûn. Haaaaa hah haaaaa haaaaa haaaaa Sebri bi xwe da kiribû.

Hesenê Heza Çawis, piştî kena giştan qediya gotinê ji Necat efendi stend:

— Heqîqeten Necat efendi wê çaxê pır xweş bû.

Weke ku tiştêk nû ditibe û bi girîngiya wi hê nû zanibe, şeleki ecêbmayi da ruçikê xwe, serê xwe pê re niv ali bada û domand:

— Yahu Necat efendi wê çaxê gundi weki iro nin bûn, birê mîn. Ehmeq bûn, bızdonek bûn. Weka dewarê bûn. Wê çaxê qere-qola cendirma li hemberi mala me bû. Xweş tê bira mîn, rehmetiya diya mîn tu car hundır û hewşê ne dimalişt. Serê sibê emê rabûna, dayika mîn i rehmeti ew qasi ku nivina hiltani û emê dêrketina derva. Ku gundiki di ber derê me de derbas bibûna, bi Tırki wê gazi kirinayê: «Hê kurdo gel bûra» Yê gundi wê bihata, rehmeti wê pê axurê, navmalê û hewşê bimalişt, çend neqıl av ji pê bida

anin û dû re beri dayê. Pirê caran barava me ji van pirek mirekên mastfiroş dikirin. Ji bavê wan ne zêde bû ku bêjin em na kîn. Bî gotineki rehmeti, cendirme wi merivi wê bavêtina qereqolê, têra dilê wi lexistana, dotira rojê hê berdana.

Necat efendi bî tinaz bîşiri, li Sebri efendi û Ehyê Şêx Îsa mihêrt, dû re li Hesên ziviri:

— Memiş onbaşi hebû, tê bira te?

Hesên soro moro bû, bî dengê lerzok:

— Erê lê çawa. Em ciranê hevûdu bûn.

Necat efendi xwe li nezani dani, domand:

— Navbera mala we û Memiş onbaşi wê çaxê gelek xweş bû.

— Lê çawa, gelek xweş bû. Ji rehmeti re digot «ana». Diya min ji wi weki kurê xwe dizani. Cilê wi yê şuştinê hebiya, tani, rehmetiyê jê re dişûst. Carna li berdilê cendirmekeki goşt, zêzewat, fêki tiji dihat. Cendirme digot «onbaşi gotiye min bêriya xwarina destê ana kiriyê, bira şivê çêkin ezê êvarê werim». Ew qas ku di navbera me de tek epeke tu ne bû. Carna dihat, ez li ber deri rûniştî me, dipirsi, diya min û bav min ne li malê bûn, wê bigato; «tu ji mewija hîz diki Hesên?» Min dengê xwe ne dikir. Ewê pênc qurûşê wê çaxê bida min, bigota de baz de Hesên! Here kakil û mewija bikire. Minê darikeki ji xwe re bikira hesp, lê sıwar bûma, bida tirada. Ezê biçûma dikana Xalit efendiyê kor, ewê herdû berrikên min tije kirina kakil û mewij, ezê têr li çarşiyê bigeriyama dû re bihatima malê ku wa yê Memiş onbaşi li ber deri ye hê.

Necat efendi:

— Ji minjirê Sûnaya xwişka te dergistiya wi bû, ne wisa?

Mirûsê Hesên tîrş û tehl bû. Eniya wi weki cotê kirav rakiri xêz bi xêz bûn. Bina wi di gelpikê de bû grêkek, ne çû ne hat. Necat efendi, keysa wi dabiyê. Lewra herweki Necat û Hesên û kesên li wê derê, herkesi dizani ku Sûna dosta Memiş onbaşi biye, çend caran der û ciran wan tevi hev ipela tazi qefaltine. Lê ji ber dê û bavê wi deng ne kirine, razibûyina xwe pê anine, wan ji hîs ji xwe brandine. Lewra di wê dem û dewranê de onbaşiki ne wek Memiş, lê cendirmekeki bejik dikaribû du sê gunda bide pêşiya xwe û bi lêdanê heta qesebê bine. Dîsa di wê dewranê de ku sileki li cendirmekeki bihata weşandin, ew gund an qesebe bê pîrs û pîrsiyên bi hêsayi dihat şewitandin. Çav lê girtin an bê xiretiya der û ciranên mala Heza Çawîş di dîrxîsûsa keça wi ya Sûna û Memiş onbaşi ve, ji vi sedemê bû. Sûna li azyê ne ma. Tevi ku jê zarok hatibû stendin ji dîsa ji xwe re mîreki dit. Pêşiyê mîr kir, paşiyê mîrê wi re bi xedemeti kareki ji karên dewletê hat ditin. Ew kar ji bi xêra serê

Heza Çawiş û Memiş onbaşi hat ditin. Necat efendi tafilê xwest vi tirsayiya ser çavê Hesen û vi hewa ne xweş hilane. Dî vi mijarê (mewzû) de pekhatî bû. Herweki ku tu tiştêki ne bûbe dest bî axaftinê kir, mijarê jî ber Hesen hilani:

— Bî rasti jî wê çaxê pir xweş bû. Gundi mina dewaran bûn. Ka serbûriyek xwe bêjime we. Efendiyê xwe re bêjim, wê çaxê dikana bavê min hebû, malê metroyê, cîl û caw difirot. Tabî jî bajêr bî metroyê dikiri, bî gazê difirot gundiya. Wê çaxê isûl wisa bû. Rojeki li ber dikanê bûm, Hacı jî çûbû ser milkan. Danê êvarê ye, yeki gundi hat dikanê, pîrsi «xwarzê barûta firotinê heye?» Min lê nihêrt. Ez hê wisa lê dinhrim, min dit Kemalê şagirdê Hemze ostayê terzi gazi kir. Bî Tirkî gote min; «min jî te re malekî sand». Ez têgihîştim. Neyse jî efendimê xwe re bêjim, min serê xwe hejand; «ha tu çi dixwazi?» Mêrik disa gote min «barût heye barût?» Min gotê: «Barût... Ka wesiqa te heye?» Mêrik li min nihêri: «Wesiqa çi?» Min gotê «haydê yela ez bê wesiqa barûtê na dim, serê xwe na kîm teşqelê». Wele mêrik li ber lavayiya pan bû. Rakir pênc banqinota drêji min kir, bî hêvi û dexalet. Weki ku gunê min pê hatibe, min wisa mirûsê xwe dilovankî kir; «Gunê min bî te hat, heke ne wisa biwa minê ne dana te. Lê disa bî sozêki ku tu, jî tu benî ademi re ne bêji...» Mêrik soz û bext da min. Min rakir pênc banqinotê wi jê stend, min gotê «binêre barûta reş e ha!» Gotê min: «Erê bavo mala te ava, riyê te spi». Wele ez çûm ba Kemal. Efendiyê xwe re bêjim berê terziyan ûtiya komirê dixebitandin, min rahişt xweli meliya komirê kir nav kaxizeki, baş li hev lefand, ani dayê. Û disa min qewitiya xwe lêkir; «binêr jî kesire ne bêji ha.» Efendiyê xwe re bêjim mêrikê min û te çû, lê dotira rojê selam û eleykum hat bî ser dikanê de. Bî bavê min de kir xirecir, ha ku me dit xalê min i Hemze keya derket. Ê xalê min i Hemze keya başbekçi ye. Başbekçi ye ema forsa bu li wi hebû li generaleki iroyî tu ne ye. Xalê min ket dikanê, bala xwe dayê xirecira mêrik û bavê min e. Bî Tirkî jî bavê min meselê pîrsi, min tafilê gotinê jî ber bavê xwe hilani, min gotê: «Xalo viya barûtê jî me dixwaze.» Mêrik qiriya, wariya, naçar... Xalê min rakir bî milê wi girt bir qereqolê. Li qereqolê goliko soro te çî xwariye, dixwi na xwi... Wele mêrikê me i gundi hem dêlva barûtê ve bî pênc banqinota toza komirê kiri, hem kutanê xwar, hem şevêki dî tewla hespan de ma û hem jî dotira rojê sed banqinot cirma xwe da hê filitî. (Yaho berê alem bû alem. Ew alem û kêfa berê li ku derê, ya iro li ku?)

Sebri efendi zûq bû li nav çavê Necat efendi nihêrt:

— Ûlan bēnamûsbav, carekî jî riyê te min hîndîk kutanê xwar?

— Çi car?

— Cara di dewsa don de te avê firoto mênikê gundi, mênik bi rê de lê warqili û hat bi ser bavê min de. Bavê min ji têra min li min xist.

— Ha mesela don...

Ehyê Şêx Îsa ket nava axaftinê.

— Bavê Sebri efendi, rehmetiyê xalê Nûri meriveki bi merhemet bû canim.

Necat:

— Ki bi merhemet bû?

Ehyê Şêx Îsa:

— Xalê Nûri ye rehmeti.

Necat:

— Bavê Sebri?

Eli:

— Belê, bavê Sebri efendi.

Necat bi tinaz bışiri, li Sebri ziviri:

— Efendi, rehmeti çawa bû?

Sebri:

— Baş bû. Xwedê wi bi rehma xwe şa ke.

Necat:

— Ew qewad baş bû? Qewadbavî..

Sebri:

— Lawo çima ji qebraxê bavê te i Hacı ne çêtir bû.

Necat:

— Ku tu wan bîdi ber hev, gotina min jê re tu ne, eşhedû billah. (Li Eli ziviri) Tu zani rojeki ez û Sebri ji mektebê dizivirin nanê nivro, li ber derê me em ji hev veqetin. Diya Sebri ne li malê bû Sebri çû mala damarya xwe firavînê. Ez çûm hundir min çentê xwe dani, rahîşt nan û penêr derketim nava deri, min dit ku-ew Lalê hebû ya ew Lalê, ya ku parsê dikir-Lalê hat ber derê mala Sebri. Ji aliki ve nan û penêrê xwe dixwim, ji aliki ve ji li Lalê dinêrim, wele careki min dit ku wahşê kemê, xalê Nûri, ew qebraxê bavê viya ji hundir derket, pêşiyê gotê: «Ha Lalê çi berev dikî?» ji aliki ve ji li der û dora xwe nihêri. Dit ku her ali xali ye, kes tu ne, hişk bi qevda destê Lalê girt kişand hundir, dû re deri girt. Min bala xwe dayê ha derê tu ne, ha derê tu ne. Wele ez hêdi hêdi, bê deng derxistin çûm ber deri, Min guhê xwe da deri wele pîxka pîxka Lalê ye. Wele ez sıvîk rabûm çûm mala wan i dinê. Min gazi xatîya Sakinê kir. Lê min jê re got ku yeka pîrsek ketîye hundir, deri ji li xwe radaye û malê dide hev. Ez û xatîya Sakinê bi hev re hatin ber deri, ew bi derença ve

hilkışı derket ber deri, ewli dengé çengel bı çingın hat, dü re deri vebû û Lalé ji hundır derket. Lalé û xatıya Sakiné bı seri li hev qelbin. Û doxina xalé te i rehmeti ji di dest de. Wele xatıya Sakiné li ser pişté xerıqi ket. Xalé Nûri yé rehmeti hat cendeké wi bı kaş kırın bir hundır. Lê ji berevki ve digotê: «Sakine, bı qurbana seré te Sakine... Sakine hû çı bú ji te.» Mın gotê:

— «Xalé Nûri, çav bı Lalé ket wısa bú. Ez gazi der û ciranan kım ,bıra werın lé binêrın erê?»

Jı aliki ve ji bı piçiti dibışırım. Li mın nihêri, seranser li mın méyizand, gote mın «here lawo, here malé». Ez hatım ber deri. Disa zivırım û mın gotê; «ji kesi re tıştek nebêjim ne wısa?» Têghışt ku ez bı tışteki dızanım. Wele nemerdi nê kır, desté xwe avêt berika xwe. Banqınoteke ket desté wi, drêji mın kır, da mın. Got: «Ne na... ji kesi re rışteki me bêje. Here bı vi pereyi ji xwe re tışteki bıkre.»

Li Eli nihêri:

— Ez ji î ser gotına te me. Rehmeti ew ças bı merhemet bú ku dilé Lalé bê zar û bê zman ji xweş dikır. Ne wısa Sebri efendi?

Sebri efendi:

— Lawo ez çı zanım. Tu nebûya bı bavé mın de tini. Xwedé ji stuyé te bıxwaze.

Necat:

— Ê qebraxbav, ew roj dané pişti nivro li mektebé me wi banqınoti bı hev re ne xwar. Ez çı ças dihatım dikané bavé te kakı û mewij ne dikır berika mın? Ma nayé bıra te?

Li Hesên ziviri, keneki ji ziké tır kır:

— Sibhanela... iro meselê mın û te dıçın û ten li ser kakı û mewij dıçıvın. Ev çı iş e Hesên efendi?

Hesên bı zoré bışiri, lê birına wi ji kûr ve bú. Dızani ku bı vé gotiné Necat efendi kevır davêje forqitiya xwişka wi ya Sûnayé. Ev kayé kevın bú ku dihat bakırın. Tafilé bı xwe ve hat, li xwe danani. Herweki ne jê re, ji yeki din re hatibe gotın, axaftiné ji ber Necat efendi hılani:

— Necat efendi, xêr u xweşi wê çaxe hebû. Bihn û bereket, qedr û qımet, insanıyet wê çaxê hebû. Her kes bı ciyê xwe dızani wê çaxê. Gundi bı gunditiya xwe, bajari bı bajariya xwe dızani. Hedê bavê ki bú bı şev çek berdın... Di navbera vıra û bajêr de qamyoneki dıxebiti, lê hedê bavê gundiyan bú ku lê sıwar bin. Ji xwe, ji eskeriyê heta eskeriyê ancax rıya gundiya bı bajêr keta. İro tu dibini ehlê qesebê bı minibusan dıçın bajêr, lê gundi tenezul na kın bı minibusan herın, bı teqsiyan dıçın. Ji ber vıyan e ku bihn û bereket, qedr û qımet rabıye, ne maye. Te dit, wê çaxê çıças xweş bú.

Gava yek biçûna bajêr, yek bi yek ji der û ciranên xwe xatir dixwest. Dîgot: «De bi xatirê we. Xêra xwe min helal kin. Çûyin heye, hatin tu ne, hatin heye ditin tu ne.» Merivên wi yên nêzik hetani ber qamyonê wê pê re biçûna, wi verêkirina. Lê iro... naybera vê derê û bajêr biye saet û niv. Dîçî û têy qet haya kesi jê tu ne. Ew çax ma bi vi awayî bû? Ku bavê me dîçûn bajêr di dagerê de ji mezînan re cil û caw, ji me zarokan re şekir tanin. Şekirê sor ê qulat. Me ew bi ben vedikirin, dikirin xirxal û davêtin stuyê xwe. Niha ew şekirê qulat ji ne man. Berê ki dikaribû goşt bikire, bixwe. Gundîya, çî bigrê pîraniya qesabê ji nikaribûn ji salê dû car goştî bixwin. Wê çaxê hini mina me eşrefên qesabê, yên xuyani ji heftê careki, du car dixwarin. We çaxê qesabeki an du qesab hebû di qesabê de. Lê iro... panzdeh in, bist in... Hetani nivro piça, pirtika goşt na mine. Tev ji ji êriş kirina gundiyan. Gundiyan qesabê li ehliyan heram kirin. Iro perê bi gundiyan re hene, bi me eşrefan re tu ne ne. Malên wan gişt bi awaki modern raxisti, yên me minasêra berê.

Ehyê Şêx Îsa, ji qabilê ku xwêya wi ji di xwarini de hebe ket nav axaftinê:

— Efendim, yê ku gundiya li ser serê me bi ser û çay kir dewlet e. Ev sûc, xeta, guneh û xirabi yê dewletê ye. Dewlet e, yê vayalî me kir. Dewlet... dewlet... dewlet...

Di «dewlet»a pêşin de Albay Yasin di ber deri de derbas bû, di «dewlet»a duyem de guhê xwe mûç kir û li hundirê dikanê mîyze kir, di «dewlet»a dawin de ket hundir.

Gişt rabûn piyan, Necat efendi bi destê wi girt:

— Bi ser çava re efendim, bi xêr hati.

Albay Yasin dengê xwe ne kir, derbasi masê bû, li ciyê ku ji Necat efendi vala bûyi rûnişt. Necat efendi di navderê de bangî çaygerê qehwê kir, hat li ser kursiki bi cih bû. Çayger hat, Necat efendi pênc şir xwest. Qewitiya şirê baş aninê ji bir ne kir. Çayger çû. Necat efendi ji çavika masê pakêta cixare ya amerikani derxist, pêsiyê pêşkeşê Albay kir, dû re li yên dinê gerand. Pakêta dani ser masê, nêziki mêvanê bi qedir.

Albay Yasin pîrsa yek bi yeki kir. Navê wan, karê wan, gund û bajarê wan yek bi yek. Tîştêki jê ve biyani ne ma. Şir hatin, belav bûn. Albay Yasin qurteki li şirê xwe xist, lêvên xwe alast:

— Baş e, şirê wi ne sor e. Devê meriv na şewitine.

Giştan bi hev re lê zivartin:

— Belê efendim, ne sor e. Devê meriv na şewitine.

Albay Yasin, li Ehyê Şêx Îsa ziviri:

— Ez hatim we dev ji sohbeta xwe berda. Ez ne bûm benda sohbeta we ne wisa?

Necat efendi li hêviya Eli ne ma:

— Hêvi dikim efendim. Ew çi gotin e? Bî hatina we em gelek dîlxweş bûn.

Albay Yasin:

— Ê... wisa be, li sohbeta xwe bîdomînin.

Necat efendi destpêkir. Ji xweşiya berê, zept û repta berê, razi bûyina ji jiyana berê, hatina gundiya û qesebê, hîvitiya gundiya yi berê û li ser serê bajariya rabûyina wan i iroyin, têveliya (ferqiteya) forsa bekçiki berê û paxav pê ne kirina bi generaleki iroyin... Kurtiya gotinê ji seri heta niha digel hev çi axaftibûn, giştan yek bi yek li ber mêvanê xwe i nû rêtin.

Mevanê nû bi pêûsa xwe li ser rojnamê hin îşareta xêz dikir, car carna «ya?... wisa ha?... hela hela... Ê weki dîn?» digot, bi wan dida nişandayin ku guhê wi her li wan e. Gotina Necat efendi yê «Xwezîla ev milyonên min ne bûna bla ew rojên kevin paş de bihatina. Ji bo wan rojên xweş minê milyonê xwe bîda» di serê wi de dizimiya. Daweta qîza xwe ya Aycan bîbir ani, cihêzê wi... Hela hela... Ew albayeki dewletê bû, lê bi milyona nîkaribû bîaxêfê. Lê ev lixugirê (mûteahidê) zêrzewatfiroşê eskeriyê bi milyona diaxaft. Bî wan zêrzewatê rîzi, fêkiyên kurmî milyonan kar dikir ha...

Bî resti milyonên Necat efendi bi arîzi nîn bû. Çar tevkar bûn. Bî her çaran hê milyon û niv, du milyonên wan diqediya. Niha dev ji lixugiriya zêrzewat û fêkiyan berdadûn, dest bi yê avakirinê kiribûn. Lê bîa qet. Albay ji qîza xwe re sarkêr (buzdolabî) kiribû, lê hê cilso ne kiribû. Dabêça (teqsîda) deynê sarkêrê hê serê vê meha ha qediya bû. Hê çi lazîm bû, çi ne lazîm bû. Digel van diviyahiyan ew ji rewsê û pergala dewletê, ji ya iroyin xweş bû, lê van çavsorên ha ne razi bûn. Na na ev ji anarşîst bûn. Ne razi bûyina ji dewletê ha bi çekdari, ha bi vi awayî ma têveliya wan çi hebû ji hev. Hem ji di vi rewsê, rewsa gerandîna awarte (sîkiyönetim) de. Albay disa bi wan re niqirand: «Yal.. hela hela...» Manyeto kir, rakir ahîzê, rawesta «(...) nimroyê grêde», ji pakêtê cixâreki kîşand, kir nav lêvên xwe. Li Necat efendi nihêrt. Necat efendi rabû ser xwe, bi hestê xwe cixara wi vêxist. Albay hilmê lêxist duyê wi di firnikên xwe de belav kir. Bî wi seri re axaft: «Ez Albay Gülmesin. Çakîr Başçawiş bîde min.»

«Kayzer»ki lejkeriyê li ber derî rawesta, Başçawiş û çar cendirmê rapêçandî jê peya bûn, ketin dîkanê. Albay Yasin rabû ser xwe, gote Başçawiş: «Van efendiya bibe, di cîyê mêvanan de bîezimîne»

Her çar efendi dî nava zincira çar cendirma de li «kayzer»ê sıwar bûn. «kayzer» bî lez jî wê dûr bû.

Dotıra rojê serê sibê, dî navbera du cendirma de Necat efendi derxistin hîzûra mazûvan. Albay Yasin kaxizê ifadê wan drêji Necat efendi kir: «Peşiyê bixwîne, dî re imza ke.» Necat efendi kaxiz seranser xwend. Reng û rûçik lê guheri, mina miriyê jî bin gorê derxistibin wisa reng jê çû. «Lî ordiyê heqaret», «piçûk ditina hêzên çekdari yê dewlete» «Lî hember pêş ve çûna ekonomik ya welati propaganda», «dewrana yekpartiyê bo gundiyan dewra zalmê û diktatoriyê ditin», «demoqrasiyê û pergala makeqanûna şesti bo ehlê qesebê û bajêr bî xirabi ditin, lî hember vê pergale dî nav geli de propaganda kîrin», «welatîyên me i eziz ticarê bajêr û qesebê dî tîkîlyên danûstandina bî gundiyan re bî sextekari û hilebaziye gunehkar kîrin û bî vê riyê dî navbera wan de tovê neyartiyê tov kîrin... Necati efendi û hevalên wi bî van darazan dihatin gunehkar kîrin. Albay Yasin Gulmesin pê re qenciki kir jê re vana got û darîngên (fadeyên) wan i dî qanûnê ceza de jî yek bî yek got. Necat efendi piştî imza avêtinê, bî destûr dana Albay telefonê hevalê xwe i Selim kir. Bî dengê niv girîni gotê: «Selim çî bivê bike, me bîfîltîne». Paşê ziviri cem hevalên xwe. Her sê efendiyê hevalên wi rabûn piya. Sebri efendi pîrsî: «Çî bû» Necati bî kovani bişîrî: «Yasin im, Gulmesin im, ez hatime, we dixesinim» Pê re jî bî qevda destê xwe i çepê bî enişka xwe i rastê girt, destê xwe i rastê kir kulm û zendê xwe i rastê bî wi awayî drêji wan kir.

Roja heştî hatin berdan. Serê wan bî lejkerki tevi sîmbelan kur kirî bû. Necati efendi heta sê meha derneket derva. Beri derketinê bî sê roja vexwendinameki (dawetiyeki) stend. Bî du saet dî stendina vexwendinamê re zivkir Evdilmecit hat malê zincireki zêr da Necat efendi, delva wi ve çil hezar banqînot bî jimartin stend û çû.

Şeva sêyem salona gazinoyê mina hewma masîyan bî dev re bû. Daweta qîza Albay Yasin bû. Necat efendi jî dî nav vexwendîyan de bû. Dî qutiyê de zincira zêrin bir da bûkê, bûk û zava her diwan jî pîroz kir. Albay hat ket milê wi bî ber bufeyê de bir. Lî ber bufeyê çend serbaz jî hebûn. Albay du wiski xwest, wiski hatin. Albay û Necat efendi piyanan jî xweşîya hev re hilanin. Piştî vexwarinê, Albay jî komê re got: «Hey... hêy! heft xwezîl bî wan rojan, hey gûdî dînya ew rojên berê çî roj bûn» Lî Necat efendi nihêrt: «Ne wisa Necat efendi?» Çav dî nav serê Necat efendi de gir bûn, gewr bûn. Riyê wi zer bû. Lê disa bî xwe şîhîti: «Belê Albayê min. Heft xwezîl bî wan roja lê bî xêra serê sê sed û çil hezar... heza... hezari» gotina xwe ne qedand, lî hev şewîşî, gurmin jî betonê çû. Necat efendi xerîqî lî erdê bû ters û ma.

1860' DI ZAZAKI

Repon **BARİÇEK**

Se û vist serri ra ver 1860'di London, Edinburg û Leipzig'di yew kitab çap biyo (Opuscule, ESSAYS Chiefly PHILOLOGICAL AND ETNOGRAPHICAL, Williams and Norgat). Nuştexe ni kitabi Robert Gordon Latham o. Ni kitabi dir riperrê 242, 243.û 244. 'di yew niwîşte (yazı) esto. Fotokopiyê niy riperran cêr di şima ra hasenê. Ze kî şima zi veynenê riperrê 242. û 243. di İnglizki û Zazaki çend qussey estê. Ma waşt kî niyan sero çend qussey bikerim. Verê verkan ma bîdim zanayîş kî ma bî xwî, sayedê Kovara SÜREÇ (1) niyan ra xeberdar biym. Ow ni riperrî û qussey Zazaki - İnglizki/Tirki, ma na kovari ra girewtim. Barey Kurdkiyê Zazaki di na eleqedarreya Sürec'i, çiydo gellek baş o. Ma şiyenê vajim kî warey Kurdki û hina vişî zi zarava Zazaki di, heya ewro, nîk û newe yew kovara Tirki di yew niwîşte vejîyên. Sürêçî no ware di yew gama biyaya eyşta.

No niwîştêy nuştexi, çiqas kî kilm û kemane bîbo zi, zanayîşbê ma hetî Zazakiyo nuştewo en verên o. Ey diyîni zi Welatanê Rojawanê Awropa di çap biyo û Zazaki dawo şinasnayîş. Niy sebebana ra, ma vanim qey erjeno kî kes sero vîndero. R. G. Latham vano kî: «Ma filolojiyê Zazaki sero çiyeki nêzanim.» Ni vatîşî ra yeno fahm kerdiş kî heyani ay roj, çiyne Zazaki sero nênusiyawo, yan zi xebera R. G. Latham'i tira çinbiya. Lathamî hetî, Kurdan miyan di hemîni ra xamêr Zazay ê û ni vatey yew gedeyê yew bab (eşîret)a Zazayan ra giyreyê. Girewtoxê niy vatan bî xwî Dr. Sandwith o. Çi fayde kî nê vajiyêno kî Dr. Sandwith'i no gede koti û senê diyo. Sewkî ma na bîzanaynim, hina weş fahm biyênê kî niy qusseyê kamder Zazaki yê. Fahm kerdişbê xwî reydi ma şiyênim vajim kî no Zazaki ey Dêrsim ra teber o, yanî ey Dêrsimî niyo. Çimka ma vajim, herrunda tipa «S» di, «Ş» esto: şut, şaurow, eşkîji û. a.b.

Zeki orijinalê niwîştî dî aseno, Zazaki zi bî vatîşbê (telaffuzê) İngılızki nusiyawo. Ma niy, tîpanê xwî reydi nuştîm. Tadayîş (tercûme)ê yîni (Tirki, İngılızki) dî zi yew yew şaşay esta, ma niy rast kerdîm. Niy şaşey (xeletey) beno kî girewtîşê niy qîsseyan ra bibê. Çimka zeki nuştox vano Dr. Sandwith'i niy qîsseyan yew tutî ra gîrewîê. Semedo kî nî tutî hîma weş zîwan nê zanawo, vatan dî ke-mane biyo. Ma vajîm: herrûnda serî dir vato «serê min», herrûnda çim î dir vato «çimê min».

Qîsseyan kî Dr. Sandwith'i tutê Zaza y ra gîrewîê û kitabê R. G. Latham'i dir ca gênê eniyê:

Kitab dî/1860 Zazakiyo ewroyî

serê min serê mi, seray min
çimê min çimê mi-n
burûê min	... bîrewê mi-n (2)
zînjê min	... zîncê mi-n
ardîşê min	... erdîşê mi-n
zoanê min	... zîwanê mi-n
dîldonê min	... dîndanê mi-n
guşê min guşê mi-n
ingîştê min	... engîştê mi, gîştê min
pazîê min pazuyê min, polê mi
hîngê min	... hîngê mi-n, nîngê mi
piê min piyê min, piy mi
mai min (may min) maya mi-n
wai min (way min) waya min
brai min (bray min) bray mi-n
paştîai min	... paştîya mi-n
porê min porê mi-n
serdo serd o (3)
aurogermo	... ewro germ o (4)
roçweşo roj weş o (4)
haşmê aşmî, aşmî
sterrai estare-y

Kitab dî/1860 Zazakiyo ewroyî

kho ko, kwo (kuw)
ahô ??? ?
derel derê-y
hoiki hak
kerghî kergî
tebexairomê	... tî bî keyr amey
bêri (5) bêrê, bêrinê, bêri
roşê (5) roşê, roşî
noan nan, nî-n
awe aw-î
qaçimê (6)	... qaç, qîjek
keimîma (6)	... keyn-a, keynek-î
lajekimê (6)	... lajek, lacek
şaurow şewra
dorî dar-î
asî asî
aurîş (awrîş)	... awrîş arbes, harguş
tajî tanzi, tazi
xoz xoz
ert erd, ard
adîr adîr
şee (sî) sîy
sêm sêm
qote (kote)	... quwet
şîmşîr şîmşêr
krêveş luy, (rêvî)
kivê (kûvî) peskoff
zaraş zereñc, zereşî

şut şit, sıt
istor istor, estor
mahını mayını, mahını
eşkişi (5) eşkişi
ké keye, kıye
sor sūr, sor

siyah siya
supéo (4) sıpl, sıpé
rausumé rakewe, bibusi
şori şori, şéré,
şériné (5)

(1) ZAZA LUGATÇESİ HAKKINDA, SÜREÇ — üç aylık siyasal kültür dergisi, úmar: 2, rıper: 11-13.

(2) Kovara Süreç dı tadayışé na qıssa şaş o. Cor ra ma va ki beno kı niy şaşey semedé şaşeya İngılızki ra bibê. Herrunda eniyan dı cer ra ma raştê yini nawnenim:

şaş

rast

birewê min: kirpik kaşlarım

(3) serd o: soğuk soğuktur

(4) ewro germ o: sıcak bugün sıcaktır

roj weş o: güneş güneş güzeldir (hoştur),
gün iyidir (hava iyidir)

supé o (sıpl yo): beyaz beyazdır

(5) bêré, bêri (bêiri): gel geliniz

roşé, roşi: kal oturunuz, oturun

eşkişi: üzüm kurtı üzüm

şori, şéré: git gidiniz

(6) Enawa fahm beno kı niy heme hiré qısseyan dı şaşey yan zi vişey esta.

ON A ZAZA VOCABULARY.

READ

BEFORE THE PHILOLOGICAL SOCIETY,
MAY THE 23 RD.

The following vocabulary is one taken by Dr. H. Sandwith from a Kurd of the Zaza tribe, one of the rudest of the whole Kurd family, and one for which we have no philological specimens.

<i>ENGLISH.</i>	<i>ZAZA.</i>	<i>ENGLISH.</i>	<i>ZAZA.</i>
Head	séré-min	sea	aho.
eyes	téhim-emin	ralley	deréi.
eyebrows	burué-min	eggs	hoiki.
nose	zinjé-min	a fowl	kerghi.
moustache	simile-min	welcome	tebéxairomé.
beard	ardishé-min	come	béiri.
tongue	zoané-min	stuy	rôshé.
teeth	dildéné-min	bread	noan.
ears	gushe-min	mater	awé.
fingers	ingishté-min	child	katchimo.
arm	pazié-min	virgin	keinima.
legs	hingé-min	orphan	lajekima.
father	pie-min	morning	shaurow.
mother	mai-min	tree	aeri.
sister	wai-min	iron	asin.
brother	brai-min	hare	aurish.
the back	pashtiai-min	greyhound	taji.
hair	poré-min	pig	khooz.
cold	serdo	earth	ert.
hot	auroghermo	fire	adir.
sun	rojshwesho	stone	see.
moon	hashmé	silver	sém.
star	sterrai	strength	kote.
mountain	khoo	sword	shimshir.

ON A ZAZA VOCABULARY

ENGLISH.	ZAZA.	ENGLISH.	ZAZA.
a fox	krévesh	a house	ké.
sing	kivé	green	kesk.
partridge . . .	zaraj	erimsos	soor.
milk	shut	black	siah
horse	istor	white	supéo.
mare	mahiné	sleep	xausume.
grapes	eshkijsi	go	shoori

The meaning of the termination-min has been explained by Pott and Rödiger in their *Kurdische Studien*. It is the possessive pronoun of the first person — my — meus — suoç, Scç.; so that séré-min — caput-meum (for mei), and pie-min — pater-meus (for mei).

So little was the Zaza who supplied Dr. Sandwith with the list under notice able to conceive a hand or father, except so far as they were related to himself, or something else, and so essentially concrete rather than abstract were his notions, that he combined the pronoun with the substantive whenever he had a part of the human body or a degree of consanguinity to name. It is difficult to say how far this amalgamation is natural to the uncultivated understanding, i. e. it is difficult to say so on a priori grounds. That the condition of a person applied to for the purpose of making a glossary out of his communications is different from that under which we maintain our ordinary conversation, gives us a certain number of words, and a context as well. A glossary gives us words only, and disappoints and disappoints the speaker who is familiar with contexts.

If this be true, imperfect contexts, like the combinations pie-min, Scç. should be no uncommon occurrences. Nor are they so. They are pre-eminently common in the American languages. Thus in Mr. Wallace's vocabularies from River Uapes the list run thus:

ENGLISH.	JURL	UAINAMBEU.	DARRE
head (my) . . .	eri-bida	tcho-kereu . . .	no-dusia
mouth (my) . .	eri-numa	tcho-ia	no-nunia.

similar illustrations being found in almost every American glossary.

In his Appendix to Macgillivray's *Voyage of the Rattlesnake*, the present writer has pointed out instances of this amalgamation in the languages of the Louisiana. He now.

Dî Nav Çandeya Gelêri De Hin Hêmanên Mitolojik

Mihemed QASIM

Dî hejmara bûri de, em li ser hin bermayeyên mitolojik bi pirs û îşaret sekînbûn. Her weki ku me gotibû; mitoloji şaxeki zanistiyê (ilmê) ni ne, dirok û sosyoloji (civakzanasti) jî ni ne. Çi bigre jî sedî not û pêncê wi dûri rastikêniyê (heqîqetê) ye jî, lê yê mayî; angî jî sedî pêncê mayî jî şertên madi yê jîyana civaki zayê, heta niha hatiyê. Hingî şertên madi (hoyên darîngî) yê civaki û aborî guherîne, baweriyên olî jî ketîne hin kirasên nû, di kirasê ola (dinê) nû de jîyana xwe domandine.

Biola îslamî yekxwedeyî hatiye nav Kurdan, lê «Xwedanê şev û roja», «Xwedanê erd û esman» jî nav Kurdan, jî Kurdistanê şaredî (sîrgûn) ne bûne, ne çûne. Ev «xwedanê şev w roja», «xwedanê erd û esman» ne xwedayê ola îslamî ye. Xwedayê ola îslamî, xalîqê kullî eşya ye. Dî «xwedanê şev û rojan» de pîranî, pîrejmarî heye. Lê di Xwedayê îslamî de yekîtî, yekejmarîtî heye. Dî sond xwarinê de kes na bêje «bî Xwedanê min», bî «Xwedayê min tê gotin. Lê di yê dinê de «bî Xwedanê şev û roja», «bî Xwedanê erd û esman» tê sond xwarin. Ev xwedan: jî bilî xwedeyê rojê; Ahûra Mazda (Hurmuz), û jî xwedeyê şevê; Ehîremen pê ve xwedekî dinê ni min. Angî ev xwedanê dewrana Zerduştîyê ne, yê dewrana pîrxwedeyî.

Mihemed pêxember sond xwarinê qedexê kiriyê. Ne tenê sond xwarina bi taşt û tevayan, lê sond xwarina bi «Xwedê», bî «Quranê» û h w.d. jî. Dîgel vi awayî di nav Kurdan de hê jî «Bî vi gola hêşin» angî bî esman, «bî vi axa ku em jê hatîne û dîsa emê herîne» angî bî axê sond xwarin, jî deştê heta navsera çiyayên bilind

ter û tezetiya xwe dîparêze. Ev hîn daneyan (done, veri) dîde me ku wek qewmên dinê Kurdan ji dî gehinekek pîrxwedeyi de derbas bûne. Ki zane belki beri Zerduştîyê dî nav wan de xwedeyê axê cihê, yê esman cihê, yê avê cihê, yê çiya cihê biye, an daristana cihê biye. Dî dû derketina her oleki yekxwedeyi de dewletên feodali yê merkezi gelo raslêhatîniye? Yek merkez, yek xwede. Ola Zerduştî çima ne li Sûri, li Trakya, li Sibîrya, lê li Îranê derketiye û heta bandêriya (hukumraniya) Med û Persan hebiye, ew ji pê re ajotiye û fereh biye. Her weki ku dewletên Emewî û Ebasi an ji dewletên mîna van Erebbê jêza çima ne pêşiya ola islami, lê dî dû wê re hatine damezrandin, li Asya û Afrîqayê fereh bûne.

Ji çiyayê Mûnzîrê heta Sipanê Xelatê, Agîrî, Zoveser, Mereto, Hazar, Şerefdîna bî kurtebirî tu çiyaki bîlînd yê Kurdîstanê tu ne ku ji aliyê der û dorê xwe ve pîroz ney ditin. Gava ji gelê ciwari bî pîrsîyan, wê pîrozahiya wî bî ziyareta navsera wî ve girêdî. Li navserê an pêxemberêki veşartiye mîna Zulkîf pêxember li Erxenê, an ji qenceki Xwedê, ewhiyaki. Li çiyaki heta eshabeki, li çiyaki dewsa lîngêa Hezretî Elî, li yeki dinê qenceki ne pêxember lê destbrakê Mihemed pêxember maye. Dî serê Gulanê de, bî qere çarşemba de, an dî hîn rojên xuyani de wê gundî û bajarîyên wî çiyayê nanê şikeva çêkin, derkevî, hafê, an kêf û seyrana li sêra xwe, an ji seyrangî oli (dînî). mistîki bîkî û bîzîvîrî malê.

Ku Kurd dî demeki rabîrdû de Îsewî bîwana, me dê bigotê ku ev ziyaret yê ezîzekî, qenceki manastîrê ye. Lewra pîraniya manastîran dî navsera çîyan, dî çiyê rê û dirbê pê ne ketî de dihatin ava kîrîn. Lê ne Kurdan ola Îsewîtiyê pejrîrandîne û ne ji mîzgeft û xwendegêhên islami li derên xalî hatîne ava kîrîn. Li ba dilê mîn sedemê pîrozahiya çiyayê me, ji van her sê sedemên jêrî yek e, an ji gîştî in:

1. Dî dewrana pîrxwedeyi de her çiyaki an ji gîştîkên çiya xwedî xwedekî bûn. Her weki li Yewnan, li Romê tê ditin li Kurdîstanê ji her çiyaki an ji aliyê xwedekî de dihat parastin an ji wargehê xwedekî bû. Ji ber tîrs û xofa çiya li ser geli, dî dewrana Zerduştî û Îslamîyê de pîrozahiya wan dî dewsa xwe de ma, lê şêl û tîmtêla wan guhîrî.

2. Kurd heta dewrana me îroyîn ji çî hindîk çî pîr, pergala koçerîyê ajotîne. Koçer havîna li zozana, zîvîstanan li deştê ne. Deşt ji bo wan ne bî xetere ye, lê çiya bî kurîyê (canawar) xwe, bî bagêr û bahoza xwe, bî berf û gêdûka xwe, bî rîyên xwe î hê keys her tîm bî xetere ye. Dî dema pîrxwedeyi de ji bo xwe parastîne ne xwedê lê bo her çiyaki xeyberîki fikirîne û bî ceweta wî xeyberîyê çiya ji

piroz ditine. Gava pir bûyna çıyayên tendûreki (volkanik) dı Kurdistanê de bê ber çava, giringahiya vé ditinê bêtur ber bı mêji dibe

3 Ruhbanê mecûsiyan (yên Zerduşti û Mazdeki) axleb dı şikêftan de, dı cıyê rê pé neketi de bı serê xwe, digel xwezayê dijin. Ji ber jıyan û mırına wan i lı navsera van çıyayan, ji wê demê vé de ji ber pirozahıya wan çıya ji hatıbin piroz dêrin. Lê ev belbı (ihtimal) ya gelek jar e, li ba dilê mın.

Lı ser kembera hejıyanê (zelzelê); welateki bı gelyên teng û kûr, bı çıyayên bilınd û tendûrek, bı her cur tebayê jakaw (heywanên wehşi), bı berf û gêdûka heşt mehi, û heta dewrana iroyin ajotına pergala koçeriyê, ji bili koçeriyê ve ji bı gom û mezre û gunditi jıyaneki dı guherên bilınd, lı qûntarên bêkeys... Na! ne gengaz e ku pirozahıya van çıyayan ji ziyareta navserê bê. Lê qedrû rûmeta ziyaretên tê de ji pirozahıya van çıyayan yê diroki û kevin tê. Ango pirozahıyek oli nı ne, mitolojik e.

Dı ser ava re ji nişka ve qevaz dan, çêri berf, baran, bager û bayê kırın ji qedexeki mitolojik e. Ji vana her yek an xwedı xwedeki ne, an xwedi xeybereki ne, an ji xwede an xeybereki bı xwe kırıye têmeıla van. Çêri yek ji vana kırın her weki çêri xwede an xeyberiyê wan bı xwe kırine. Bê şık xwede an xeyberê vana tola (heyfa) xwe ji meriv re na hêle, meriv dihingêfe.

Lı welatê me weki çıya, her çem û robarek xwedi pirozahıyeki ye. Dı nıvisara hejmarê rabırdû de em lı ser pirozahıya Dicleyê lı gora ola islami-û lı gora mitolojiya Yewnani mabûn. Her weki ku tê zanin «Roj» dı nav Kurdan de heybereki piroz e. Pirozahıya Rojê, dı bawerıya Kurda i kevin de serdestirê gışti pirozahıya ye. Bı zaravayê Zazaki ji tirêjê re «tinc» / «t'j» tê gotin. Navê Dicle / Diclê ji Tinc+lê, Tij+lê tê. Ango a ku tinc an tij lı serê ye. Pirozahıya Diclê ya kurdi ji vé tê. Serkaniya Diclê ti, ji nav Kurden Zaza (Dimili) dızê. Mina Diclê lı Kurdistanê tu serkanıya çem » robareki tu ne ye ku ne xwedi pirozahi be. Lı Dêrsimê ava Mûnzirê, lı Riha (Ûrfa) yê Kaniya Zelixa (aynzelxa), ava Miradê û h.w.d. Çı bigre dı piraniya zayına serkaniyan de motifa xwe avêtına şikefteki, tendûreki an ji agir heye. «Qencê Xwedê Mûnzır xwe avêt qefayê, bılqın bı qefayê ket, jê ava Mûnzirê za, Kalê Mûnzır ji bú çûkeki ji qefayê firi û çû. Feqi lı ber tendûrê çav bı búka keşe ket, hınarik lı búkê sor búbûn, dilê feqi biji, gote búkê; «Bo rıza Xwedê ramisanek ji hınarikê xwe bide mın» Ji bo rıza Xwedê búkê dilê wi ne hişt, ramisanê dayê. Pé re ji xezûrê wê dı wan de derket, ji şerma búkê xwe avêt tendûrê. Bı fermana Xwedê bılqın bı tendûrê ket, jê robarek za...» Dı van de ji têmeıl guherıye, teşeki islami welgirtıye. Lê jézayi her mitolojik e. Beri islamıyê ye. Ev ro

û robar, ev çem û cobar çima li şafirên Erebiştanê ne dizan? Li wan dera ma qet qencê Xwedê tu ne bûn. Gîşt qencê Xwedê hatin di welatê me de hêwirin?..

Bê şik ev sedemên ha, sedemên himber (esil) ni nîn. Bedew-sede.n in: birûbawerîya dewrana kevin ya mitolojik bi kirasê ola nû ango Îslamîyê xemilandine. Bo jiyana wan ev her pêwîst e. Lewra gava ku ev baweriyên kevin dijberî birûbawerî û ramanê ola Îslamî bûn, ji aliyê hêzên-çî çekdari çî çandeyî, vê ola nû ve wê bihatina gunehkar kirin. Her wekî Îsewîyan kirin. Zerzenga ronahîya li serê Apollon hilandin dan ser serê Îsa û ezizan, lê ji aliyê dîn ve şûnwarê (heykelê) wi şikandin. Li ser mîzgafta Dîdyma xaç rewêrtin lê ji aliyê dinê ve rewêrtiyên (yontu) xwedeyên malê, yê ku şikandin, yê ku ji bini rihotin.

Di welatê me de bi pirani di nav şêx, mela, axa, mirek û yên di bin kûrmê wan de mayî de «bi gora bavê hev» sond xwarin heye. Mihemed pêxember sonda mekrûh didêra. Heta dara xurme ku rojek li pesarê li bini nîmêj kiribû, bo nebe ziyaret û mîsilmannê jê re bi çewtî secde ne bin hat birin. Sonda bi gora mîrîya bi temami di ola Îslamî de mekrûh e. Lê digel vi awayî hê ji di welatê me de bi gora şêxa, bi yê axa û mireka tê sond xwarin. Ji gelek xwendevanên me ve tê zanin ku; mirovati di pergala bapir-perestîyê derbas biye. Di wê pergale de, mirov bi serê bav û bapirê xwe, bi gora wan sond dixwar. Ev pergala berî Zerduştîyê ye. Lewra em dizanin ku Zerduştîyan ji ber pirozahiya axê, mîrîyê xwe venedîştartin. Didan ber rawiran. Gan (ruh) da'mî bû, yê demdemi (mîwaqat) laş bû. Ji ber vi, laş ji aliyê teyr û tirûdan ve bihata xwarin ji tîstek ne dibû. Disa di vê baweriyê de ax ewqas piroz bû ku veşartina mîrî di axê di axê de gunehkari bû. Di vi demê de li deverên dîn mîrî dihatin şewitandin. Digel Zerduştîyê ve ji ev bawerîya ji dema bapir-perestîyê heta îro hat. «Bi gora bavê te», «Bi gora Mirxan axa», «Bi gora Şêx Îsa» û h.w.d ev cur sond ji jiyana kevin tîn. Ji jiyana ku mirovan bawer dikirin ku bav û bapirên wan i mîrî bi ganê (rîhê) xwe wan diparêzin ji xerabiyê.

Her wekî vi, bi serê hev sond xwarin ji, hêmaneki mitolojik e. Bi serê hev sond xwarin arizîyê bi mîra ye. Bi serê zilaman tê sond xwarin. Pirek çiqas mezin û navdar be ji bi serê wi nayê sond xwarin. Zilam, çî dibe bila bibe bi serê wi tê sond xwarin. Bi gumana min ev hêman ji dema destpêka pedersahiyê maye. Gêrçî hê ji kûrm û kirasê pedersahiyê bi temami ji nav me ne hatiye malîstin, lê ev cur sond cih bi cih xurtayîya xwe wînda kirîye.

Ji vê nivîsarê pêşbira me, ne vejandina van awa an hêmanên mitolojik in. Ev kevneperestî ye, teqlid e. Lê bi berhev kirina hêma-

nên mitolojik derxûsa jiyana me i kevî de hin daneyên etnolojîk (gelzanîstî), sosyolojîk (civakzanîstî) tén bî dest xîstî. Disa ev daneyên mitolojîk dî warê pişeyê de dibî sedemê dewlemend bûyîna nûmayan (sembolan). Û bî vana zargotî (folklor) bêtir bî awakî xweş tê tégîştî û bîşaftî.

Hêmanên mitolojîk; dî jiyana rojê, dî strana, dî çirok û çirvanokan de, dî baweriyên ku jê re «îtîqadên batîl» tê gotî de veşarî ne. Divê em vana berev kî. Berev kî lê, bê xîrab kîrî bê guhartî, bê lê zêde kîrî nûyê kêrî kîrî. Û derxî nav warê raberîzî (mînaqaşa) û lêkolîne.

Em jî bir ne kî ku ev jî perçeki jî çandeya me ya gelêri ye.

VER GIROTİŞ

GELİC

Eni,
Mezge cin,
Pirik besta.
Lewtiyay gunidi.
Falaqa,
Elektrik,
Torbé qum.

Eni,
Xelasé zana
Derbakı amé
Felka ser.
Hérsé ma
Gani bi
Pirodayrsé derbandı.
Ma xesénay
İni,
Wa qay
Ver girotiş, ewrado.

Çibenokê Zazaki

Arêkerdôx: DEWIJ

- 47 — Pontila vaşi, vîstî kaşi. / Pantila vaşi eşî kaşi. / ERDİŞİ(EYŞD.
48 — QUTİYA qefelnaya ya, rayiri sero vîstî ya. / TIRBI.
49 — Rewti pey banan dî kewti. / ÇURANIKI.
50 — Rewti (rowti) pey bani dî kewti. / RAYİR.
51 — Rêz rêz, hetani (heya) Tewrêz (2). / RAYİR, MIJLEWR (Mij-
loki).
52 — Roj nê firreno, şew firreno. / ŞEWŞEWIKI.
53 — Serra wext gudikan xwî dî kenno. / WERS.
54 — Sêni heya (heta) Amîni (3). / AŞMÎ.
55 — Sîyênî, mûyênî, darênî. / QOYSÎ-RESENE-BARGİNÎ (DARLOQ-
LOQ-RESEN).
56 — Şan dî mî nehey sûri diy, nîmajî ez warîştî kî çînnî. / ESTA-
RE Y.
58 — Şew û roj bar wenaye wo. / ESTUNI.
59 — Tasa camî, pîrrê vami. / Tasa mî pîrr vomi ya. / ASMEN Û
ESTAREY.
60 — Telpê da, hewşê da. / GÛTA SILLÎ (TEPIKA SILLÎ).
61 — Teptepîki, qurmiçîki. / GÛTA SILLÎ.
62 — Tim û tim vinderte wo. / KEYE.
63 — Xalê mino çaç siya, bani sero reqesiya. / Kalo siya, bonî sero
reqesiya. / DÛY (DUMAN).
64 — Yew çî mî esto, ammani vindeno, zimîstani geyreno. / QEYSÎ.
65 — Yew çî mî esto, binê ardî ra geyreno, herri fineno qayme,
çimê jey (yê) çînnî. / MUŞ.
66 — Yew çî mî esto, ey ra nêbo kê mîreno. / HEW.
67 — Yew çî mî esto, şono xwî ra pey nê hownêno (ewnêno). / Şew
û roj şono, xwî ra pey nê heênêno. / RO, AW.
68 — Yew çiy mî esto, çiyeki sey jey (yê) derg niyo. / RAYİR.

- 69 — Yew çiy mı esto, derg o, seya cé (yê) çinnika. / VENG.
No vera şino o ver, sersêwa cı çinya. / VENG.
- 70 — Yew çiy mı esto, ez dano erro nê şikêno, ez dano aw ro şikêno. / Kerre ra guneno nê şikiyêno, aw ro guneno şikiyêno. / Ko ra guneno arro nê mireno, guneno awk ro mireno. / QAKID.
- 71 — Yew çiy mı esto, ez kuweno nê kuweno nê barreno. / HER.
- 72 — Yew çiy mı esto, hêwt hebi cillan xwı ra dano. / PIYAZ (PIYONZ).
- 73 — Yew çiy mı esto, hendi kı derg o, şono nême y asmêni vıla beno. / DÛY (DUI).
- 74 — Yew çiy mı esto, hırı roji leyrekanê xwı vejeno, hırı roji dı verra dano. / ARÛŞ (ARWÊŞ).
- 75 — Yew çiy mı esto, lewe ro kuweno nê mireno, dekuweno aw mireno. / QAKID.
- 76 — Yew çiy mı esto, lewi y vero şono lurikneno. / MEQES.
- 77 — Yew çiy mı esto, nimaji şono şan dı yeno, ki yeno fekê yey (jey) akerde maneno. / SEWL.
- 78 — Yew çiy mı esto, şono, heya yere y geyreno, ome kıye fekê yê akerde moneno. / SEWL (SOL).
- 79 — Yew çiy mı esto, rêzil rêzil heta towre y simeri. / MLILOWR (MORCELA).
- 80 — Yew çiy mı esto, sêne ra tunci dano. / BORANI.
- 81 — Yew çiy mı esto, şew geyreno, roj nê vejêno teber. / LÛY (LUI).
- 82 — Yew çiy mı esto, şerri dı yew ray guda xwı dı kenno. / Yew çiy mı esto, hetani şan dı gında xwı dı kenno. / MEYBI-GÛŞ.
- 83 — Yew dapira mı esta, dere dı pina xwı ra dena. / DEWQI (TOWQI).
- 84 — Yew dapireka mı esta, billa sebeb (veng ra) nengan kê çine-na. / ZERENCI.
- 85 — Yew gome y mı esto, mı to ra besto, yew esturı sero yo. / PIRNIKI (ZINCI).
- 86 — Yew tasa neheyane spiyan ma berdı bani ser, nimaji ma şı kı çiyeki çino. / ESTARE Y.
- 87 — Zımıstani şono, wesarı yeno. / HEJHEJIKI.
- 88 — Çakité cı yaşıl o, olıka cı sūr a, gocagê cı siya yê. / ZEBES (HINDI).
- 89 — Çiyêkê mı esto, ardi bin ra şino, riyê cı merdumi ra sıpe wo. / SIRSİ.
- 90 — Çiyêkê mı esto, handê bolda bızan o, şew ra şino şan de yeno, handê ju kaşda pera ça gêno. / MOCLEY (MIJLOKI).
- 91 — Çiyêkê mı esto, şew ra yeno, şan de şino. / ROJ.
- 92 — Dara zınêra, goşare kınara. / BALCAN.

- 93 — Dı siyé, pé qarşuwa nexş kenê. / SIYÊ ADILKANI (KUÇLAN).
94 — Gındê sıya wo, gındê sıpi ya. / AŞMÎ (ASMI) (4).

-
- (2) TEWRÊZ : Yew şaristanê İnan i, Tebriz.
(3) AMINÎ : Yew dewa Piran i.
(4) Çibenokanê corênan ra;
3., 5., 16., 40. dormarê BEDLÎS (MUTKÎ) ra,
18., 31., 32., 33., 45., 69., 70., 88., 89., 90., 92., 93., 94. dormarê SÊW-
REG û hina vişi dormarê ÇERMÛGI ra arê biyê.
Çibenokê bini dormarê PİRAN û GÊL i ra arê biy. Arê kerdiş
dîmbazanê kî ma rê ardım kerdo, inan rê sipês. - Arêkerdox.

ESTENAKI

Pira Hewt Sera

Arêkerdox: DEWIJ

Cay bi, cay şi, hewt hebi keyneki biy. Şi yew siloy ser kay kerdni. Heme hewtin ra yewi tizi kerdî. Têdini va «Serbê bira y mi, mi nê kerda». A yewi va:

— Serbê golika çarı mi nêkerda.» A yewi tira va:

«— Qey ti nê vana serbê bira y mi, ti vana serbê golika çarı mi nê kerda?»

A keyneki şî keye, va:

«— Dayê, qey bira y mi estê?» Maya ja va:

«— E. Va:

«—La kî estê, kura yê?»

«— Hewt bira y tu yi, şî pey hewt koyan û hewt royan, xebe-têne.

— Dayê ez şona jini hetî.

— Keyna mi, ez tu ri yew hero herrên viraza, wenişî şu. Labrê tim vaji «Çû çû!», ti vaja «Hoyşş!» rijêno.

Keyneki weniştî şî. Şî, bêviri va «Hoyşş!», her rijîya, tepa ageyray.

Hamey va:

— Dayê herê mi rijîya.

— Mî tu ra nê va, me vaji «hoyşş!»?

—B'oyni ez tu ri ena ray zi virazena hewna birijîyo ez tu ri hîni nê virazena. Mitu ra nê va, vaji «çû çû!», hetana kî ti şêre berdê mexera ver. Key kî ti şîya berdê mexara ver, tani kutîki ha berê

mexera ver di, ay wextan vajî «hoysşî», wa herê tu vajo gurr birî-jiyo. Kutaki wa xurriða beri di şêri, ti vazdi zerre y mexera. Wa pey kutaki tu nigêri.

Keyneki ayawa kerd û şiy, yew zerre di çini bi. Keyneki karê birayandê xwî pêro kerd, va:

— Estuni abî, ez yena tu zerre! Estuni abî, a şiy zerre, bira y ja ki şandî hamey keye, va:

— Yarebi ino çî gure wo, ino kar û gure y ma, kami kerdo? Di hirê rojî ayawa kerd, yew şew bira y şeniki va:

— Ez gani gışta xwî bişeqna, solî deka veyni ino çiyî çikare wo eki yeno ma rê kar keno û xwî ma nê nawneno. Bira y şeniki gışta xwî şeqnay, sol dekerdî, pawit. Gışta jey dejena, veşena, hewnê jey nino. Nême y şewî diy ki estuni miyan ra yew çî vejiya. Ewniya ki yew keynek a. Şî va:

— Hurmê, ti çî ya, çî kara ya?

— Ez waya şîma ya. Hal û hewal ma şiy yew silo y sero ronışti, inawa inawa ma inca resay. Ay vatan hemini dey ri vana. A wu bira y xwî hini pê şa biy. Birayanê ja va:

— Ma yew şîret tu kenê. Ewta yew cawo ki çep kuweno, ne der o ne ciran o. Adirê xwî çirray hewna meki.

Biray keyneki xwî ri şonî karê xwî, keyfê jîni weş o, vanê wa ma hini karê ma kena, çî ma bedernena. Yew pisinga jîni zi esta. Yew rojo tincin keyneki ki şî bani sero ronışti, pisinga xwî ra va:

— Şu veyni adirê ma esto? Pisingî şî adir aşana, miza xwî dekerdî, yew mura zengî devistî welî miyan, ageyray va:

— E, adirê ma esto.

— Zûri meki!

— Ti bawer nêkena lujîni ra b'oyîni, b'ow bereqêno. Keyneki lujîni ro hewney ki mura ha bereqêna, va qey raştiko adir o. Bi êre, keyneki şî, 'enê çî birayandê xwî ser nana, şî ki adir çînniyo, pisingî a xapênaya. Çeqmaq çînno, ciranê jîni zi çînnî, ê tena yi. Şî bani ser hewney, va veyni kura dûy yeno. Hewney ki pey hewt koyan di yew duy yeno, warışti, vazday heyani weyra. Şî ki yew pira hewt hebi serey ja yi. Hewt keyney piri estê. Wir keyna ja yew sere y ja çokdê xiw nawo, eşpijan geyrenî, eşpîceki kenî. Keynânê ja va:

— Oo keyneka rindî, ti çî geyrena? Maya ma tu veyna, tu pirçî ra wena. Ti çî hameya, gure y tu çî yo?

— Ez hameya tikê adir. A yew way weriştî tikê adir, yew şane, yew qaliba sabuni, yew iro da bere, va:

— Lezî şu, heta maya ma nê weriştî. Maya ma ki hamey, tu resay ini sabunê xwî finî; wa celq û cellaw bestîyo, wa tu nê resso.

Hewna tu ina kerd ki tu resena şane y xwi finî; dar û ber bestêno hewa y ay şani garr yeno. Owra şelte y ja pa maneni owra pa maneni. Ti gellek ca xellesnena. Hewna tu ina kerdki nuzdi kena, a qahba iroydê xwi finî, wa ca y pêro sermitikî bi, wa owra bisurrikyo, owra bikuwo, ti hini keye resena.

Keyneki 'eyni aya hewa kenâ, piri ja dûma ki şona, keyneki zav tersena. Peyni xwi keye resnena. Şonâ zerre y keyî, berê xwi, xwi ro padena, pira hewt sera yena berdê ja ver, vana:

— Tizi kena, ber şiknena, gîştâ şadı milosnena!

— Eman, hewar! qey çî qowmiya wo, nêmi xeyr o ki ez hameya mi tikê adir berdo! Ez ber xwi ro nê akena, ti yena mi wena.

— Ino ber di yew şeqal esto, gîştâ xwi tiro veji, ez gîştâ tu milosnena.

«— Neey, ti gîştâ mi dirra kena.» Hêviya keyneki biriyay ki piri nêşona, keyneki gîştâ xwi veti piri milosnay, şî. Keyneki roj bi roj tîmo şatîyay. Birayanê ja va:

— Waya ma, qey ti îndî şa'tiyêna, ti nêweş a?

«— Ney.» Bira y şemki va: «Ez eyro keye di vindena.» Tirke-manê xwi gurot, şî axur. Wa jey nê zana bira y ja keye do. Bî êre. Diy ki pira hewt sera hamey beri ver û va:

— Tizi kena, ber şiknena, gîştâ şadı milosnena!

Lajeki axur ra tirkemanê xwi pa na, a tê ser di qelebiyay. Piri lajeki ra va:

«— Tu gi y mi werd, yewna mi ra mi!» Lajeki zanayni ki sew yewna pano, piri gani bena. Ey va:

«— Darba ma Mehmedan yew darb a!» Piri rep bi y, merdî. Lajeki va:

«— Waya mi, ino çî gure wo?» Keyneki peyni ra heya verni abî aşan deyri va: Hal û hewal inawa, Semedê adiri ra. Bira y ja warîştî şiy, heme çiyê a piri û keyney ja guroti, ardi. Herkesini yew keyna mare kerdî. Keyne y piri tîmo a keyneki ra qahriyay. Birayanê keyneki va: «Ina waya ma gani kareki nêko.» Birayanê keyneki zanayni ki ay cenêki tira qahriyêni. Tasa ja, firaqê ja, kuze y ja ciya bi. Yew roj keyneki keye di nêbi, şî çay ra hamey ki teyşaney ver merda. Ay cenêkan tasika awa ja nîmîta. A va:

«— Ez teyştî merda, tasika mi kure ya?» İni pê fek ra va:

— Ma nêzani tasiki-masiki kura ya. De hima kuzi bigiri, xwi ser di ki. Keyneki bê hemdê xwi, kuzi xwi gurot, xwi ser di kerd. Keyneki çi zanayni ki cenêkan yew leyrekê mari dekerdo miyanê kuzi. Keyneki va:

— Ayy! Yew çi şî qırrika mı! İni va:

— De çi yo inka, qay yew viya lay a.»

Roj bi roj Keyneki nan û awki werdi, ay mar pizze y ja di xışin bi. Ay cenêkan mêrdandê xwi ra va:

— 'Eyb o, ina waya şîma cay yew gurewo nebaş kerdo. Yew hewa biki bere, nêki şîma şermezar benê.

Bira y ja hamey pêser, pê mişewrey va qey raştê yew hewa kerdo. Ay va «ti bikişî», ay va «ti bikişî»; destanê jini nê gurotini ki waya xwi bikişî. Bira y şeniki va:

— Bidi ez ja bena yew ko ra kışena.» Birawo şenik estorda xwi wenişt, wa xwi vîstî peydê xwi, guroti şî. Şî, şî yew kodê xirr û xali ver di vîndert vîndert dexeriya û va: «Ez bawer nê bena ki waya mı çi kerdo.» Way zi hêzana sekenê bere, va:

— Bira y mı, ma şoni kura?

